kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliya navîn

bîrnebûn

HAVÎN/2011



50

bîrnebûn

Tidskriften utkommer 4 nummer per år.
Sê mehan carekê derdikeve / Üç ayda bir çıkar.

Utges av Apec-Förlag AB
Hejmar 50, havîn 2011
Ansvarig utgivare: Ali Çiftçi
Edîtor: Ali Ciftci Seyfî Doğan Muzaffer Özgür
Koma redaksiyonê
A. Çiftçi, Dr. Mikaîlî, H. Erdoğan, M. Bayrak, İ. Türkmen, M. Duran, Muzaffer Özgür, Nuh Ateş, Sefoyê Asê, Vahit Duran, Mem Xelîkan, Mustafa Mıh û Yusuf Polat

Adress
Navnîşana li Swêdê
Box: 8121, SE 163 08, Spånga/Sverige
Telefaks: 0046-(0)8-761 24 90

E-post
info@birnebun.com

Internet
www.birnebun.com

Têkilî/İlişki
Danimarka: Irfan Baysal, 0045-27 11 58 83
Avusturya: Cüneyt Dagdalan, 0043-69 91 11 55 294
Amerika: Mam Recall, mamoste.kart@yahoo.com

Belavkirin / Dağıtım
Ewrupa: Muzaffer Özgür/Bîrnebûn
Postfach 900348 , 51113 Köln / Almanya
Tfn: 0049-172 298 24 51

Türkiye/Ankara:
Dipnot Kitebevi, Selanik Caddesi No: 82/32
KIZILAY / ANKARA
Tfn: 0312-419 29 32

Anatolia Muzik Center
Cumhuriyet Mah. Turan Cad. No: 29 A
Polatlı-Ankara
Tfn.: 0090-312-622 94 36

İstanbul: Selahattin Bulut/Medya Kitapevi
İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 130/6, Beyoğlu

Biha/Fiyatı
Europa: 5 Euro • Türkiye: 2,5 YTL

Abone
Swêd: 400 SEK • Almanya 40 Euro
Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

İsveç hesap numarası
(Bîrnebûn) postgiro: 468 65 12-7

Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê / İsveç dışındaki aboneler için
APEC, "Bîrnebûn" PlusGirot-Stockholm/Sweden
BIC: NDEASESS
IBAN: SE85 9500 0099 6026 4686 5127

Çap / Baskı
Apec-Tryck AB

ISSN 1402-7488



Sergirêdana keçeka kurd li Xorasanê

Her nivîskar berpirsê nivîsa xwe ye.
Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Bîrnebûnê re tên, serrast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwediyan nayên vegerandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û Komela Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.

www.arsivakurd.org

NAVEROK / İÇİNDEKİLER











4 Ji Bîrnebûnê – ***Alî Çiftçî***
7 Li ser hilbijartinên meclîsê 2011 – ***Nebi Kesen***
9 Kurdê Heymenê mîhricanê Xidirellez pîroz kird – ***Xamgelî Bane***
13 Gotinên mezinan – ***Dilkeştî Kêfkur***
14 Cotek solî reş – ***Dr. Mîkaîlî***
16 Di dema kevin de „***Sergirêdan***“ di nav civaka kurd de – ***Nesrin Bayram***
18 Zimanê helbest û sitranan – ***Mam Recall***
21 Tu yê biwînî– ***Mem Xelikan***
23 Memedî Zaydo Mehmet Bayram, Bavê min – ***Nesrin Bayram***
26 Kurdên Xorasanê û rêya Kurdistanê – ***Şêrko Cîhanî***
31 Kefenê reşbelek – ***Xizan Şîlan***
33 Ne bes e – ***Mem Xelikan***
34 Şîîra kerî – ***Dilkeştî Kêfkur***
36 Patîka – ***Seyfi Doğan***
37 Cenga bi hotê berfê – ***Nuh Ateş***
40 Kal – ***Seyfi Doğan***
44 Çend întiba û rasthatinên gera li Kurdistana azad – ***Nuh Ateş***
63 İç Anadolu iskancı Kürtlerle ilgili bazı izlenimlerim – ***Kamil Sümbül***
68 Hatırlı köyüne (Gundê Xofê) sürülen Ermenilerin dramı – ***İbrahim Korkmaz***
72 Ankara'nın Kürt köyleri "Kürtçe eğitim istiyoruz" – ***Hayrettin Değirmenci***



www.arsivakurdi.org

Xwendevanên hêja, va ye sê mehên din jî derbas bûn û em bi hejmara xwe ya nû dîsa bi we re ne. Di van sê mehan de bayê ku li welatên ereban rabûye, weke "bihara ereban" tê binavkirin, serhildanên li dijî desthilatên ne demokratîk in. Piraniya desthilatdarên li van welatan 40-50î sal in, bi darê zorê û bi pişgiriya welatên rojava desthilatdariya xwe meşandine. Li gor guhartin û pêşketinên li rûyê dunê çêbûne tu guhartin di warê mafê demokratîk de li van welatan pêk nehatin. Êdî ev welatên rojava jî têgihêştin ku li van welatan guhartin pêwîst in, loma jî piştevaniya serhildanan dikin.

Li Suriyê jî ji meha adarê vir ve ye her rojên înê li hember desthilatdariya Bişar al-Assad xwepêşandan çêdibin. Heta niha nêzikî 2 000 însanên sîvîl û 400 esker hatine kuştin. Ji 3 000 însanî zêdetir winda ne. 12 000 kes jî hatine girtin. Li tevayiya bajar û bajarokên Suriyê xelk nerazîbûna xwe nîşan dide. Piraniya dewletên endamên yekitiya neteweyan li hember Suriyê hêdi nerazîbûnên xwe vekirî nîşan didin. Di vê rewşê de berpirsiyarî û destkevtiyên giranbiha jî ji kurdên başûrê biçûk re derdikevin holê! Li vî beşê welêt, bi yekitî û hevgirtineka niştimanperwerî kurd dikarin roleka baş bi dest bixin.

Piştî komkujîyên dema Hîtler li Almanyayê, li welatên Ewropa û Skandinaviyayê baweriyek çêbûbû ku dê careka din komkujiyên nîjadperest ê li van welatan pêk neyên. Bi rastî jî li hemû welatên Europayê, ji perwerdeyên seretayîyê heta universîteyan, li hemper nîjadperestiyê û kirinên dema Hîtler bi berfirehî agahdarî û zanyarî têne dayîn. Li welatekî xwedî hewqes zanyarî, demokrasî piştî 66 salan li Norweçê, bi destê nîjadperestekî wek Anders Behring Breivik ve dîsan bi armancên nîjadperestî bûyereka komkujî di 22 tîrmehê de pêk hat û 77 kesên sivîl ku piraniya wan keç û xortên endamên AUF(organa ciwanên partiya karkiran), *Arbeiderpartiet* (Sosyaldemkrat) bûn. Ji wan qurbaniyan yek jî Bano Raşid, 18 salî, keça kurd, li kampa Utêyayê(Oslo) berpirsa AUFê bû. Di 1996an de ji başûrê Kurdistanê ji bo jiyaneka aram bi dê û bavê xwe ve, di sê saliya xwe de hatibû Norweçê. Em li vir, bi xemgînî li hemû malbatên ku zarokên xwe winda kirine û hemû xelkê Norweçê re dibêjin; serê we sax be, êşa we êşa me ye jî!

Guhertinên ku li welatê me jî çêbûn, bêguman bandora xwe li her kurdekî û li me jî kiriye û dike. Kêm an jî dereng be, vê carê kurdên bakur gotinên xwe kirin yek, partî an jî dîtinên xwe berhev kirin û wusa beşdarî hilbijartinan bûn. Netîce jî zû diyar bû ku yekbûyîn hêzeke xurt peyda dike û hertim baş e. Em hêvîdar in di rojên pêş de jî kurd li her derê bi hev re bin.

Di hilbijartinên 12 hezîranê de her çiqas astengiyên dijwar li hember partiyên kurdan

www.arsivakurdi.org

hebûn jî kurdan karibûn bi rêxistineka serkeftî ya bi rêk û pêk, bi namzetên xwe yên serbixwe beşdarî hilbijartina bûn û li piraniya bajarên sereke yên kurdan bûn hêza yekem. Li pirê bajar û bajarokên din ên ku kurd lê dimînin, wek qeza û navçên Anatoliya Navîn jî piştî AKP bûn hêza duyem û piranya dengan stendin. Ev bi serê xwe serkeftineka berbiçav e. Balkêşiyeka din a vê hilbijartinê; kurdan dikaribû hem li hember hîle û xurdeyên dewletê bi zanyarî derkevin hem jî mafê xwe biparêzin û hîleyên ku li ser sandoqan çêbûn vala derxînin.

Ev destkeftinên ku îro li bakurê welêt rûdane dîrokî ne. Bi bedela xebat, ked û berxwedanên bi milyonan kurdan û bi hezaran şehîdan gêştiye vê qonaxê ku bi rêya diyalogê pirsa kurd li Tirkiyê bêt çareserkirin. Desthilatdariya Tirkiyê dikare provakasyonan bike daku vê destkeftiyê têk bibe! Bi baweriya min divê sîyaseta kurd vê rewşa nû pir bi dîqet bişopîne û bibe xwedî biryar!

Siyaseta kurd di çareseriya pirsgirêka kurd û Kurdistanê de li beşa Tirkîyê dikare li nimûnên ku li welatên din bûne helbet feyde jê bibîne, lê ne hewce ye ku em Îrlandayê an jî modela baskan ji xwe re bingeh bigrên û heta wan welatan herin. Başûrê welêt ji bo me nimûna herî nêz û berbiçav e.

Dewleta Tirkiyê bi serokatiya Recep T. Erdoğan ji bo xelkê Filîstînê dawa serxwebûnê û ji bo bakûrê Qibrisê, ku nifûsa xwe qasî bajarokeka Kurdistanê jî tuneye, dawa serxwebûnê ji welatên dunyayê re şert dajo!.. Lê, ber xwe nabîne, xelkê kurd li Tirkiyê tenê dixwaze bi mafê şexsî razî bike!

Bêguman gelek guhertin li dunyayê çêbûn. Li dunyayê katastrofên xwezayî çêbûn, krîzên aborî çêbûn, hilbijartinên nû çêbûn, serhildanên gelan çêbûn, welatên nû ava bûn, hinek dîktatoran dev ji textên xwe berdan û revîyan, hinek jî hê berxwe didin ku textê xwe biparêzin. Lê xuya ye, ev bayê ku li welatên rojhilat rabûye dê nesekine heta ku ew guhartin pêk neyên!

Xwendevanên bi rûmet, em jî dixwazin piştî vê hejmara xwe ya 50î hinek guhertinan di kovara Bîrnebûnê de bikin. Ne ji aliyê navarokê ve lê tenê ji aliyê form û estetîkê ve. Di hejmara piştî vêya de hûn ê jî van guhertinên nû bibînin.

Em dixwazin ji we xwendevanên birêz jî guhdarî bikim bê ka piştî 14 salan hûn çi guhertinên din ji kovarê dipên. Ew dîtin û pêşniyazên we dê hem karê me hêsan bikin û hem jî me serwext bikin. Helbet em ê nikaribin bi yekcarî hemû dîtin û pêşniyazan bi cîh bînin, lê ev dîtin û pêşniyazên we dê di hejmarên pêş de bên berbiçavkirin.

Di vê hejmarê de bi birêz Nebî Kesen bi sernivîsa *Li ser hilbijartinên meclîsê, 2011* de hilbijartinê şirove dike.

Xamgeli Bane dîsan bi zarê şexbizinî ji zargotin, folklor û çanda wan wek mîhrecana Xidirellezê bi sernivisa *Kurdê*

www.arsivakurdi.org

Heymanê mîhricanê Xidirellez pîroz kird agahdriyek li gel çend helbastan nivîsiye.

Dilkeştî Kêfkur, bi xwe ji yayla Kêfkur ku bi ser Kelhasan ve ye di vê hejmarê de ji folklora me bi navê *Gotinên mezinan* çend nimûne berhev kirine. Em li vir, mamoste Dilkeştî Kêfkur re dibên tu her bi xêr hatiye û em li vira ha li benda nivîsên te yên edebî û folklorîk in! Dilkeştî Kêfkur bi helbesta xwe ya bi navê "*Şîîra Kerî*" di quncika helbestan de jî cîh girtiye.

Birêz Dr. Mîkaîlî bîranîneka bi navê *Cotik solî reş* li ser ededeka di nav kurdên Anatoliyê de ye ku ber bi windabûne ve diçe aniye ziman. Bihara çûyî xenzurê wî wefat dike û dema ew diçe şîna xenzurê xwe, li derve çavên wî bi cotek solên rêş ên li ber derî ne, dikeve. Li gor edet û rûsimên me yên jibîrbûyî, dema yek dimir solên wî didan ber derê malê. Niha ev edet hema hema li pirê deran nemaye. Dr. Mîkaîlî bi vê bîranîna xwe careka din ev edeta me ya berê bi bîra me dixe. Em li vir ji birêz Dr. Mîkaîlî û herwiha ji hemû malbata rehmetî Bilalê Hectêhira dibên, serê we sax be! Rehma Yezdan li rehmetî be!

Nesrîn Bayramê bi sernivîsa *di dema kevin de "sergirêdan" di nav civaka kurdan de* bi wêneyan sergêrêdana keç, bûk jin, jinebî û jinên pîr nivîsîye. Ev sergirêdan li ba kurdên Anatoliya Navîn heta van salên dawî jî hebûn. Lê niha ber bi wendebûnê ne.

Birêz Mam Recall li ser zimanê helbest û stranan gotûbêjek bi navê *Zimanê helbest û sitranan* dîtinên xwe aniye ziman û bi çend stranan nimûnan dide.

Birêz Nuh Ateş bi gernameyeka bi wêneyan ve xamilandî li ser çûyîna xwe ya başûrê welêt, bi sergotina *Çend întiba û rasthatinên gera li Kurdîstana azad* hîs û raya xwe ji me ra qal dike.

Şêrko Cîhanî ji kurdên rojhilat, ji bajarê Mehabadê, bi navê *Kurdên Xorasanê û rêya Kurdistanê* bi bîranineka xwe me li nav kurdên Xorasanê digerîne. Birêz Şêrko dê ji vira ha car caran bi lêkolînên xwe di rûpelên Bîrnebûnê de, bi me ra be.

Birêz Kamil Sünbül ji kurdên Çêrmûgê, dema ku li Konya Seydişehirê bûye cara siftê kurdên Anadolê nas kiriye. Bi sernivîsa *İç Anadolo´daki iskancı Kürtlerle ilgili bazı izlenimlerim* ev bîranîna xwe bi zimanê tirkî nivisîye.

Birêz Îbrahim Korkmaz li ser ermeniyên ku surgunê gundê Hatirliyê bûne bi tirkî bi navê *Hatırlı Köyüne Sürülen Ermenilerin Dramı* ji gundîyên wê derê guhdarî kiriye û ji bîranînên Derviş Aydar agahdarî wergirtine.

Birêz Hayrettin Değirmenci bi sernivisa *Ankara`nın Kürt Köyleri "Kürtçe Eğitim İstiyoruz"* di sala 1991an de belavkiribû, jiber girîngiya perwerda bi zimanê kurdî me di vê hejmarê de ev nivisa careka din weşand.

Bi hêviya ku ev hejmar jî li gor dilê we be, heta hejmareka din bimînin di xêr û xweşiyê de!

Ali Çiftçi

www.arsivakurdi.org

Li ser hilbijartinên meclîsê 2011

Nebi Kesen

12ê hezîranê hilbijartinên meclîsa Tirkîyeyê pêk hatin. Berê hilbijartinan eşkere bû ku AKP ê dîsa bi serê xwe bibe hikûmet. Ev texmîn rast derket û partîya AKP nêzikî ji sedî 50 deng girt. Çar salên pêşêya me Tirkîye yê ji alîyê Erdoğan û hevalên xwe ve careke din bê îdarekirin. Terefa Kurd vê carê yekîtîyek berfireh pêk anî û bi navê "Bloka Ked, Azadî û Demokrasî"yê beşdarî hilbijartinan bûn. Ji alîyê din ve, ji hêzên çep yên Tirkîyeyê da jî namzet di nav blokê de hebûn. Hilbijêr bi dengên xwe, him li gelek bajarên Kurdistanê him jî ji metropolên Tirkîyeyê 36 mebûs ji bo gruba blokê derxistin. Ev encam bo kurdan serkeftîyeke mezin û girîng e. Dû partîyên din jî, CHP û MHP, ketin parlamentoya Tirkîyeyê.

AKP ji dû alîyan ve di hilbijartinan de negihîşt armancên xwe. Hejmara mebûsên AKPê ji bo destûreke (anayasa) nû kêm in. Bona vê, destûr bi hevkarî û alîkarîya partîyek yan jî partîyên din dikare bê amadekirin. Armanca AKPê ya din jî ew bû ku BDP û hêzên din yên Blokê bi ser nekevin. Lê AKP li pir bajarên Kurdistanê deng wenda kir û hilbijêran tercîha xwe bo namzetên Blokê bi karnîn. Ji alîyê din, balkêş e ku hin jî nêzîkî ji sedî 50 hilbijêrên kurd dengên xwe dan partîya AKPê û sîyaseta wê bi vî awayî tesdiq kirinç

Astengiyên BDPê û hêzên din yên Blokê gelek pir bûn. Êrîş û bincavgirtinên li hemberê sîyasetmedarên kurd ji sala 2009an vir de berdewam dikin. Desteya Bilind ya Hilbijartinê (*Yüksek Seçim Kurulu, YSK*) demekê ji alîyê namzetên Blokê nîqaşek peyda kir. Vê bûyerê atmosfera hilbijartinan xirab kir. Lê dîsa jî di saya xebatên hêzên Blokê de, kurdan îradeya xwe bo sîyaset û Terefa Kurd eşkere kir. Di meclîsa Tirkîyeyê de, gruba mebûsên kurd û dostên wan êdî faktorek mezin e.

Piştî hilbijartinan, YSK mebûsîya Hatîp Dîcle, ku di nav operasyona KCKê de hatîbû girtin û niha di zîndanê da ye, îptal kir. Dadgehan (mehkemeyan) ji CHP 2 û ji Blokê 5 mebûsên girtî serbest berneda. Li şûna Hatîp Dîcle, namzetek jin ya AKPê ji Amedê bû mebûsa meclîsa Tirkîyeyê. Ji bona helwesta YSKê, dadgehan û bêdengmayîna AKPê, di dawîya hilbijartinan de krîzek çêbû û hin jî çareser nebûye. Rewşa Hatîp Dîcle û pênç mebûsên din ji alîyê kurdan ve

www.arsivakurdi.org

bû sebeba protestoyeke mezin û boykota meclîsê. Mebûsên Blokê bi temamî neçûn meclîsê û sonda xwe nexwarin.

Bi hilbijartinan ve girêdayî, dikarin çend encam bo pêvajoyê li vir bên gotin:

- Sîyaseta kurd cîhê xwe di xebatên legal û parlamentoyê de xurttir kir. Temsîlîyeta kurdan êdî ji alîyê sîyasetmedarên wan pêk tê. BDP û hêzên din yên Blokê yê bi xebatên xwe di meclîsê da zorê bidin hikûmeta AKPê ku ew sîyaseta xwe ji alîyê mafên kurdan ve biguhare.

- Li bajarên Kurdistanê roj bi roj îdare û temsîl dikeve dest sîyaseta kurd. Rola partîyên Tirkîyeyê hîn jî kêm dibe. Di salên pêş de, di navbêna AKPê û bi taybetî BDPê, bi gelemperî Tevgera Kurd de rekabeta sîyasî yê hîn jî germ bibe.

- Tesîra AKPê bi projeya "birayetîya olî" di nav kurdan de bi temamî ji holê ranebûye. Serokê AKPê R. T. Erdoğan di kampanya hilbijartinan da ji alîyekî ve behsa "birayên kurd" kir, ji alîyê din ve jî dîtînên "senteza tirk-îslam" anî ziman. Hilbijêrên kurd yên ku dengên xwe dan AKPê, nakokîya sîyaseta kurd ya AKPê baş fam nekirin.

- Armanca kikûmeta AKPê di dema pêş de destûrek nû ye. Xuyaye ku bi destûra nû jî pirsgirêka kurd ê çareser nebe. Çima ku zîhnîyet û sîyaseta AKPê li dijî qebûlkirina mafên kurdan in. Mînakek: AKP û partîyên din (CHP û MHP) daxwaza li ser zimanê kurdî wek zimanê perwerdehîyê red dikin. Hevdîtîna her sê partîyan ji sîyaseta dewletê tê. Statûyek fermî li ser nasnameya kurd û zimanê kurdî di dema hikûmeta AKPê de jî ne mimkûn e.

Hilbijartinên parlamentoyê 2011 Belavbûna deng û mebûsan di nav partîyan de		
Partî	**Miqdar (%)**	**Mebûs**
AKP (Partîya Edelat û Pêşvaçûnê)	49,9	326
CHP (Partîya Gel a Komarê)	25,6	125
MHP (Partîya Tevgera Netewîst)	12,9	53
Bloka Ked, Azadî û Demokrasîyê	6,7	36

www.arsivakurdi.org

Kurdê Heymenê mîhricanê Xidirellez pîroz kird.

Xamgeli Bane

Mîhricanê Xidirellezê kurdê Heymene 12 yan, îmsal le 8 gulan le Hozê Şêxbizinîyel (Özköyler) le Şawlu hate pîroz kirdin. Îmsal le Mîhricane ke ra bîranînê Ömer Hakbilen (Mellê) hate pîrozkirdin nêziki penc hezar kes je Heymene, Polalî, Qulû, Cîhanbeylî, Golbaşi, Engurî, Qonya viyirê heta je xwerelatê (Rojhelatê) Anatolîa xelkê kurd ra vîronewiyîne ra mêknewiyinê zan û çandê xûyan gurdo wîn, coş vin, gowend girtin, bazdan. Herkes dizanî ke nêziki çarset pencset saleke kurdgel je Mezopotamya ve bar kirdinî û ve ranandino hatiyin le sî kuncê Engurî, Qonya û Qirşehir şûn girtiyin û çen set sale ke je zanê xûyan je çandê xûyan tiştî mêk nekirdiyin û yandiyinê ve î ruje.

Kurdgeli Heymene danzdê sale ke le nav xûyan gurdo rivin û xidirelleze pîroz dikerin. Mîhricane ser siftay danzdê sal verci eye ve nûyatî Mellê le dêyel hoze



Berîvan, Adar, Zelal di pîrozkirina cejna Xidirellezê de.

www.civakkurd.org



Haymanayî di cejna Xidirellezê de govendeka germ gerandine.

rihat ve piroz kirdin. Ewi heta ke le salê 2011 le Şêr (Enguri) hat ve kuştin le kurdê Heymene û le kurdê Anatolîa Navîn serdikîşa. Le ey pîroz kirdingel pişti firê kesi dingel jî hestin. Le Şawlu binmalê Mellê, je Saze Ozan Ahmet Demir, je Gozgoz Kek Eşref, je Ewdalî Kek Tuncay û Kek Eşref, İhsan Çoban Mehmet Dağ. Îmsal desteyi Partiye kurd BDP ji firê vî. Mîhricanê îmsal ve destî Tahir Koparıcı hat ve pîroz kirdin. Îmsal hûnermend firê vî. Koma Awaz, je Dersim Ozan Dîyar, je Amed Amedlî Apo, je Heymene Ahmet Demir, Mehmet Doğan,Yılmaz Koyuncu, je Cîhanbeylî Bulduk Serbûlent Kanat, je Polalî Jîyanê Uğur, je Canimana Dedo, je Qerajdax Ehsan û Muharrem Xelikan ve klam û guraniyeli xûyan, je Şawlu Serbaz Şükrü ve hûnergeli xwê xelke coş kirdin.Helbestvangel İzzet û İsmet Bağcı ve helbestgele ke xwend, Hozan Ahmet Demir Guraniyeke le ser Ömer Hakbilen avirdivîyê ve ser yek je xelke fire çepik elgirt. Helbestvan Xamgeli Bane helbestgele ke ve zanê Şêxbizinî le ser yek avird le dem Beriwan, Zelal û Adar hat ve deng.

Le Mihricanê îmsal hilbijartine nezik vî. Ra hilbijartine ra ke qise vikerin je Dersim Milletvekili Şerefettin Halis, je Qonya namzetê îmsal Hacı Mehmet Bozdağ je Engurî namzetê îmsal Cercüş Utaş û Sadrettin Güvener hatin û qise kirdin. Mîhricane seet dêyane heta seet hîşdîyane ranand.

www.arsivakurd.org

Çûn vikerim tarifite
Ke çe vişim leyaqite
Dalik cardik tu nîyarî
Heyfim rîyay xurtitîyete
Gune gune Mellê gune
Tim saxe re dilimane
Wella firê lêt diyerdîn
Le şêr Polalî Heymene

Le ser Mellê: Ozan Ahmet Demir

DOTE KE DİLDARÊ ÎŞTÎYÊ

Min mayimle navi ey çar kûye
Ve teyna îştêm riçê je ey dîye
Pirs dayn veyek heta mirdine
Îmiro rîlêm û riçê nêngirê le ban pîle

Îme dildari yek vîn ra dileman sewend xardîn
Pêjîrê sore û xweşîyeliman gordiyek beş kirdîn
Kenîn, yîristîn, bidizîyeliman rayek voşardîn
Dêma heta îmiro vîye dileman, dileman kûştîn

Meylêm û meço dîye lêm tengo ri vû
Hûlmim dimiçiqî,destit bira re naw destim vû
Bî tu ra vimirim kûrê dîve
Min yê tu vîm,meylêm ve teyna le ey dîye

Vikûşêm,de bini xake kerêm jê dîyaw hero
Le xakê banim giligopik vidane û avê meke hero
Bira hûşko vû pelkelê weki min, ve vêy mekef
Va bira lêrî verîkê, tu meviste zû hero

De hero kûre mengir le piştit
Bira viyîrî çêwgelim ra ocaxînit
Ke zeqi xwim netanistim û navit viçirim jî
Çevim nêxim le çêvit, çerx meke piştit!!!

www.arsivakurdi.org

MİN

Min kurd im şêxbizin im
Bij û bexerem je vîr nêkerim
Le zanem xavind riderkefim
Je xwim şem nêkerim

Min kurdim şêxbizinim
Zanem je vîr nêkerim
Weki zaru rû dinya gî
Mi jî ve zanê xwim rikenim

Min kurd im şêxbizin im
Ve zanê xwim qise rikerim
Sewendi giran û gewre rixwerim
Zanem da dewlemendo vikerim

DİFİRİM

Difirim difirim
Weki cûciy difirim
Balgelim dişekinim heyî dik ve joro difirim
Je navo xweşim îmiro
Je dilim avî germ diherîkî ve nûşko
Bîser û bîber difirim
Le bani kurdgeli şawlû rifirim
Îmiro Şêxbizingel gûrdo vîye le hendiyek
Gî gordiyek
Min rave ve şavîn difirim
Balyelim heyî dik firê rişekinim
Heta ban ewrgel difirim
Tim û tim le ay şûna
Dest le nav desti yek
Bazdani şên û gewre vigirin

www.arsivakurdi.org

Gotinên mezinan

Berhevkar: **Dilkeştî Kêfkur**

- Lome li pê ne, dû însên têne.
- Hezar pez, li siya darekê mexel tên.
- Ev meriya hêkik bê zerik e.
- Destê desta bişon, destê çerx bibin devriya bişon.
- Kî xweş e, evî baş e.
- Zik têr e, boçê bel e.
- Mêş wenda ye, gurî sefa ye.
- Dikaliye, şîr nadîye.
- Cot hûr bajo, kûr bajo, zû bajo.
- Bûka ser hespê meriv nizane para kê ye.
- Giya li ser kokî xwe dirize.
- Ralê bûkê bûkê ra.
- Dostiyê tirka, here qirşa.
- Ecer hatin, kevn xelat in.
- Bû helac e, nebû muhtac e.
- Bû xerman e, nebû derman e.
- E we li tata kirî, hîn tu baranê neşuştî ye.
- Erzan kirî, hewan dirî.
- Bi lêxistinê meri teva nabin.
- Xûn bi xûnê nê şûştinê, xûn bi avê tê şûştinê.
- Xwedê nede seriya, nede deriya.
- Kevirî dilive, şunê xwe nagirê.
- Kevira pêşîyê xwe da ru ke. (deyîm)
- Dev xastin çi ye, kor veşartin çi ye?
- Yekî eç dikîye, yekî paç dikîye.
- Çî neçê para keçê. (deyîm)
- Navî min î sor e. (deyîm)
- Xal xelk in, ap mulk in.
- Me kusî dane çêrandin.
- Serî xwe li xwe dixîye.
- Serê meriya bi xwediyên meriya gir e.
- Mebê xal e, mebê ap e, tu yî ehmaq e, tu ye bîxape.
- Nênikên te hene, tu ye serê xwe bîxurîne.
- Merîyê serê xwe bîxwe girê bîde, xelk serê merîya girê nade.

AGAHDARYEKE GIRÎNG

Em dixwazin di her hejmareke xwe de, ji cil û bergên kurdên Anatoliya Navîn wêneyekî kevn di ***Bîrnebûn***ê de biweşînin. Bi vî awayî em ê hem bi tevgirêdana kurdên Anatoliya Navîn bizanin, hem jî em ê hay jê hebin ku kincên wan ên berê bi çi awayî ne.

Bi rîca û bi kêfxweşî em bi hemû kurdên Anatoliya Navîn didin zanîn ku: wêneyên kesên ji malbatê (jin-mêr), bi kinc û tevgirêdanên kurmanciyê li ba we hebin, ji kerema xwe ji me re kopiyekê bi rê bikin. Bi vê yekê em ê bi dewlenediya tevgirêdana xwe bizanin û em ê wan kesan careke din bi bîr bînin.

Redaksiyon

www.arsivakurdi.org

Cotik solî reş

Dr. Mîkaîlî

Xeber tê, telefon lêdikeve, ya ku em jê ditirsin bibîhîzin, ya ku em gî li bendê ne, lê qalê nakin, bû.

Mêrê mêra, bavê fiqara, aristokratê kurmanca, zana, xwanda û meriyê giranbuha Bilalê Hectêhira, Bilal Axa çûyî rehmetê!

Yek ji axayên kurmancên Anatoliyê, kurdên çolê, alîyê Balayê gihîştîyi Yezdanê dilovan û mezin...

Her mirinek zû ye! Her mirinek bê wext e! Wext ne wexta sekinandinê ye, rawestin gune ye.

Em bilêta xu ji firokeya yekê dibirin û ber bi Enqerê, mala şînê difirin. Em dixwazin bigîjin ser mewta wî, nimêja wî, mala wî, em dixwazin bigîhijin şîna wî... Di berbanga siweka sar a Enqerê de em tên ber derî mala wî.

Ning li min giran diwin, junî naşkên, dil hîn zûtir lêdikeve, serî li min gêj diwe. Çav tijî me, kelgirî me. Yek ji min ra tiştikî biwêje yan jî ha bi şaştî li min biqewile, kes nikare pêşiyê li giriyî min bigrê. Dizanim, lê ya herî giran diwînim jî.

Li navça paytexta Tirkîyê, li Enqerê, li ber derî malê cotik solî reş diwînim... Pêşta ew bala min nakşînin, ez bi berda narim. Meriya digot qey hin kesan ew li vir ji bîr kirine, yan jî avêtine derva.

Lê dûra, bi yekva bêkontrol çerx diwim, terim li ser sola da ziq diwim, disekinim. Vana solê Xenzûrî min in. Wek hertim bi boyaxkirî, dibriqî, reş! Lê îro şûna wana li ber derî malê ye!... Lê îro ew bi xu di zik wanda nine!

Çima?

Ji kûrahiyî tarî, edet û rûsimên me yên ji bîrbûyî, tên bîra min.



Solên rehmetî Bilalê Hectêhira.

www.kurdiva.org



Gora Rehmetî.

Ku ew li ber mirinê ne, wek xewn û xeyalekê ne. Berê li cem me yek rehmetî bû, solên wî ji şev da didan ber derê mala wî, nizanim ji ber çi? Boyi çi?

Divê ku gotina ew xebera giran û reş ji cîran û meriya ra, bi vî avayî dihat gotin. Heval, hogir, ciran, herkes pê bizane ku xadanî va solana mala xu, zaf zêce xu, dunya şîrîn terikandiye û derketiye rêwitiyeka dûr û dirêj...

Rêwitiya bêpaşva zivirandî!

Çûye dunya walî!

Û belki jî ji bo xêra wî ji kesekî fiqare ra bibe dermanek. Ew dikare wana hilgirê û ji xu ra pêke. Ev tiştana di çilûskeke çûk da, di gavek nayê hêjmartin da di bîra min da derbas bûn. Ew du cot sol wekîna li ber derî, li ber çavên min gir bûn, mezin bûn, bilind bûn.

Ez li ber wan zîq bûm, mam! Dil li min ra bû! Hêndû tu kes, yan jî tiştek tunebû ku bila pêşiyê li hêstira bigrê. Ji jor da xar bûn û wek baraneka havînê rijiyan!...

Ew edetên me yên kurmancan ji ya dorberê, ji ya cîrana cuda, dîsa xu derxistîwûn pêş. Di nav deryaya tirkan da xu eşkere dikirin. Ji wanên din re carik din, bi riya cotik solî reş hewûna xu diqîriyan.

Xadanî va solana berî 60 salî bi hatina xu ya li Enqerê re ra wana dawûn ku ka ew çi insan in, çi kurd in!

Bi esl û eseleta xu, bi camerî, rabûn û rûniştina xu, Enqereyîyan ew nas kirin. Zû bala wan kişand ku ew tu ne gundiyên hov in. Xwedan edet û rûsimên giran û kevn in. Ew qasî tozek xalî bê ziman û bê xwadan jî bimînin, qedîm û bi binyat in!

Tu quwetek nikare rûsimên hezar salî yên kal û bava ji holê rake.

Tenê cotik sol, em tê da nebin jî, li ber derî malekê, li quncekî paytexta we, besî we ye! Jinên me hêndû kilami şînê nestirên jî, por û serçavi xu nerûçikînin jî, em hene, li vir in!

Bi cotik solî Bilal Axa, Bilal Dalkiran, meriye nazik, zirav, efendi, begzade!

22.04.2011, Keçiören – Enqere

www.arsivakurd.org

Di dema kevin de „Sergirêdan“ di nav civaka kurd de

Nesrin Bayram

Berî sed salî keçikên bi kezî, jinên pîr yan jî jinebiya her yekê bi awayekî serê xwe girêdidan.

Sergirêdana keçikan

Keçikan guliyên xwe hûrik hûrik badidan. Guliyên xwe yên ku heta ser pişte dadiketin bi ben, bi morî û bi tiştên din dixemilandin. Fes didan serê xwe. Li dora fesê valayên sor, zer û şîn girêdidan. Porên xwe di bin valayê re derdixistin. Eniya fesê sê qor zêr yan ji mecîdîyên zivinî pê ve dikirin.

Piştî çend salan dîsa keçikan porê xwe mîna berê dikirin, guli duhûnandin û dixemilandin. Lê li ser fesê hedin mecidiye û zêr pê ve nedikirin. Keçik û bûkan bi ser fîstanên xwe yên reng bi reng de moriyên gir û dirêj bi suwê (stûyê) xwe ve dikirin. Di nav jinan de perçem û biskbirandin adetek bû. Bisk li dora guhkan dihatin birandin. Kinc û cilên keçik û bûkan ji cawê sipî dihatin çêkirin. Di rojên şahî û dawetan de kincên kesk, sor û zer li xwe dikirin. Li ser kincên sipî piştên sor, li ser yên sor




Figen Yildirim



Azize Yildirim

www.arsivakurdi.org



Nimûneyek ji sergirêdana bûkan.



Nimûneyek ji sergirêdana jinan.

piştên şîn girêdidan. Kesên ku cilên reng bi reng li xwe dikirin piştên xwe jî ji van cilên rengîn didirûtin.

Sergirêdana bûkan

Bûkan kofîk didan serê xwe. Eniya kofîkan bi zêr û zîv dihat xemilandin. Li ser kofîkê valayên sor û zer dihatin girêdan. Bûkan valayên reş girêdidan. Wekî din jî tenê bûkan „şemhati“ û „xerhatî“ girêdidan. Xerhatî ji qumaşên reş bi gulên sor, şemhati jî ji qumaşên reş yên bi naqşên sipî dihat dirûtin. Vala îro jî li Kurdistanê ji wan qumaşan tê çêkirin.

Sergirêdana jinên pîr

Jinên pîr qumaşê kevin ji kofîkên xwe derdixistin, bes textikê kofîkê didan serê xwe. Kitana sipî bi ser kofîkê de berdidan, ew jî di binçenga xwe re derbas dikirin û li ser serê xwe girêdidan. Derdorên kofîkê jî bi valaya reş dihat girêdan. Lê piştî demek dirêj êdî jinên pîr jî kofîk nedan serê xwe. Îro bes kitanên gewr didin serê xwe û şarpên zer û reş didin ber eniyê.

Sergirêdana Jinebîyan

Li ser kofîkê valayên reş girêdidan. Car caran jî bes şarpên reş didan serê xwe.

06. 2011 Ankara

www.arsivakurdi.org

Zimanê helbest û sitranan

Mam Recall

Di her helsbet û sitranekê da, bûyereke cuda û bûyereke balkêş tê ziman. Helbest û sitran, lewma tên gotin û lewma tên sitran. Lewma di jîyana mirovatiyê da cîhê helbest û sitranan girîng û bi rûmet e.

Hemî helbestvan û sitranbêj him dilgir, him diltenik û dilpaqij in. Ew kes mirovên gelek camêr in...

Qet tukes an jî dewlet ne bi girtîgehan, ne jî bi zilm û zorê nikarin çogên wan kesan bînin xwarê... û nikarin dengên wan rawestînin.

Helbestvan bi helbest, sitranbêj bi sitranên xwe carinan mirovan radikin ser pêyan. Û deng û gotinên wan wek hêzeke xweza dibe banga şervanan.

Şervan bi bandora wan dengan çekên xwe diavêjin ser milên xwe û bi wî awayî ji bo parastin û azadiya gelên xwe diherin şerkirinê.

Di demên wusa da banga kek Cigerxwîn dibe wek bahoz û birûsk, hundirê ezman didirîne. Û wek banga li çiyayên Kurdistanê wiha belav dibe û wiha tê bihîstin.

Kurdino, merdino pir xweş e serxwebûn
Ew demên tar û teng, ko din vane çûn
Dest bidin hev hemî, pêş kevin em hemî
Da biçin bo welat, yan mirin yen felat
Roj li me hate der, zû şiyar bin ji xew
Ev dema ceng û şer, paş ketin êdî hew
Dest bidin hev hemî, pêş kevin em hemî
Da biçin bo welat, yan mirin yen felat

Birêz Şivan Perwer bi dengê xwe yê xweşik û watedar wiha piştgirî dide gelê xwe û wiha sitrana xwe distirê.

Gelê serfîraz
Dijminê dijmin
Dostê aştîxwaz
Em xweşmirov in
Ne hirç û hov in
Lê çi bikim bê şer
Dijmin naçe der
Bav û kalê me
Dijîn tev serbest
Naxwazin bijîm
Ta ebed bindest

Ew camêrana carinan me xemgîn jî dikin. Û ji ber gotin û dengê wan hestêrên me dilop dilop tên xwarê û sîng û pêşên me şil dikin.

Deng û banga wan carinan jî me şên û şad dikin. Li cejn û dîlanan em bi sitranên wan govendan dikişînin û dilîzin. Bi kurtî karê helbestvan û sitranbêjan

www.arsivakurdi.org

karekî girîng û bi berpirsiyarî ye.

Ew kesên di heman demê da, hunermend zanistyar, rewşenbîr û rêber in jî. Ji ber wê hindê divê em hertim rûmet û qîmetê bidin wan û wan kesan bikin taca serê xwe.

Kalê min rihmetî Bekirê Oxçî di xortbûyîna xwe da bi govenda xwe, bi sitranên xwe dihate nasîn. Di kalbûyîna xwe da jî çîrokên pir xweş û balkêş vedigotin. Rihmetî berê çîroka xwe digot, xweşik û ziravik, hêdî hêdî distirand.

Min di himbêza kalê xwe da çendek çîrok û sitran jî fêr kiribû. Lê mala min ava nebe! Min ji xeynê sitrana Memikê yên din ji bîr kirin.

Hema hema berî bîst salan min di demên xwe yên vala da bi zimanê kurdî û tirkî nivîs û helbest dinivîsandin.

Tevî kilama Memikê min çendek xebatên xwe jî beste kiribû. Ev cara yekemîn e ku ez van besteyên xwe ji bo kovara Bîrnebûnê eşkere dikim û diweşênim.

Arzû û daxwazên min ew e ku sitranbêjên me van sitranan bistirên û wan wek xebatekê têxin nav çand û muzîka Kurdistanê. Ger mûzîk û avahiya binî, ger aheng û awaza van kilaman amade ye. Sazî û pêwendarên hêja dikarin têkiliyên xwe li gel kovara Bîrnebûnê bimerînin.

Nîşe: Ev sitrana bêdestûr nayên sitrandin. Maf û bikaranîna van sitranan tenê ji hêla kovara Bîrnebûnê da hate rayekirin.

Kilama Memikê

Sibê zû rabûm
Serê min diêşiya
Ez bê te nabim
Memikê min li çiya

Te digo negirî
Anikê xwe qurban
Lo lo nagirîm
Şîna te dikim

Xebera te dan
Dilê min qetiya
Ax! Ez bimirama
Çavên min nedîya

Te digo negirî
Anikê xwe qurban
Lo lo nagirîm
Şîna te dikim

Ez dê çi bikim
Ez ê bêbextê
Bêhêvî mame
Li vê sal û wextê

Te digo negirî
Anikê xwe qurban
Lo lo nagirîm
Şîna te dikim

www.arsivakurdi.org

Kanî navê min
Çelûheft salê min
Kanî navê min
Baş bû rêya min hay hay hay
Him salê min
Him navê min
Him rêya min hay

Wenda bû eşqa min
Kanî berxa min
Kûr be çavê min hay hay hay
Him eşqa min
Him berxa min
Him çavê min hay

Derew bû umrê min
Wêran bû mala min
Derd dan dilê min hay hay hay
Him umrê min
Him mala min
Him derdê min hay

Hatim jibîrkirin
Wextekê ez şêrîn bûm
Navê min Recall
Wekî çem û kanî bûm
Ava min zelal

Hêdî hêdî mezin bûm
Wek her zarokan
Berê bihar, payîz hat
Paşê zivistan

Min gelek heval girtin
Ji nav gel û xortan
Li mal mîna bilbilan
Li der bêziman

Paşê eşqek peyda bû
Piştî bîst salan
Ew çi keçek bedew bû
Ala Kurdistan

Êdî ji welat dûr im
Naşêm bifikirim
Wek koçberên nênasîn
Hatim ji bîr kirin

Kurdistana delal
Tu delala min î
Tu xezala min î
Tu li vê dinê
Behişta min î

Tê zanîn ku
Her navê te bûye gulistan
Em bê te nabin delalê
Were Kurdistan

Tu delala min î
Tu xezala min î
Tu li vê dinê
Behişta min î

Êdî were hey delalê
Çavên me li te
Qey nebe, wer xuya bibe
Em li benda te

Tu delala min î
Tu xezala min î
Tu li vê dinê
Behişta min î

www.arsivakurdi.org

Tu yê biwînî

Mem Xelikan

Hecî bi lez kete muayenexana toxtor.

– Pi .. pi.. pixaltî, e e etikê pirr nexweş e. Zû zû zûke, ka tu çi bikî?

Hecîyî tat wû. Ji ber stresa nexweşîya dayîka xwe, hê pirr lê dima. Peyvek, çar pênç caran şuva ji devê wî derdiket.

Toxtor:

– Hecî telaşe neke. Xaltîyê wûne hundir. Ez mês kim ka çiyê wê heye.

Hecî, xaltî anî muayenexanê.

– Xaltîya Eş, çi bû? çiyê te heye?

Eşê:

– Qurbana te me, zikê min diêşe.

Toxtor, muyena xaltîye kir, tiştekî bitirse tunewû. Derzîyek lêxist û got:

– Xaltîya Eşê, tiştekî em bitirsinî tune. Hetanî êşa te derbas nebe ez te ber nadim.

Nîv saetê şuva, êşa xaltîya Eş sivik bû. Ji wê şuva, toxtor dest bi henekan kir.

– Xaltî, lawê te Hecî, ez dawetî mala xwe kirim.

– Ew, ji bo çi ye?

Got:

– Pixalti, rokê were mala min, ji te re berxekê serjêkim.

– Wê xalti bi qurban, Hecî min wer got, te jî hîna kir!

– Çima xaltî?

– Ez, daka Hecî me. Golikî xwe rind nas dikim.

– Were mala xaltîya xwe. Ez, te bi mîvan kim. Ez, dayîka wî me. Tu caran, li mala xwe nanek nedaye min. Ji te ra jî berxa serjêke!

Hecî:

– Çi çi çi ma, etê? E e ez bi şanakim, cu cu culiqe kî jî, ji ji ji pixaltî xwe re se.. se... serjêkim?

– Toxtor: Dizanim, xalti tu ya bikî. Lê; min dixwast nanekî pixaltî xwe

www.arsivakurdi.org

bixwim.

Xaltiya Eş:

– Xwedê we bibexşîne hevûdu. Lê xwarzî tu, bi gura xaltiya xwe bike. Aha te dî, ji berxê dakete culiq, pêçeke din şuva, yê dakeve xoroz te hay jê hebe!

Xaltiya Eş, golikê xwe rind nas kiri wû. Çend rojan şu va Hecî, rokê hate cem toxtor.

– Pi .. pi.. pixaltî, he he henîşka min û junîyên min diêşene.

Toxtor:

– 70 qeyme ketine navbera henîşk û junîyên te. Derbasî paşîyê be. Ez jê bi derxim.

– Î î î ku he he heftê quriş dayî te ne ne nemeriye.

– Culiqên te hene?

– E e erê

– De, tu yê culiqekî wûnî ji min re.

– Na na na welle. E e e ezê xorizekî wûnim.

– Ew jî, bes e.

Toxtor, pixaltiyê xwe muayene kir, şuva ji bo ku wî xûlî bike;

– Pixalti, tu dizanî, xanima min keça axa ye. Ji xanimê xwe re bêje: Bra, xoroz bipertilîne. Dû va ji min re wûne. Keçên axa, rûnanin bi perikên xorozî te re meşqûl nabin.

– Weng e, xa xa xanima te, keça axa ye. Lê ya min, ke ke keça şivana ye! Tu tu tu yê, xoroz biwinî, got û biderket.

www.arsivakurdi.org

Memedî Zaydo Mehmet Bayram
Bavê min

Nesrin Bayram

Her zarokek di jiyana xwe de, tim ji vê ditirse ku kesên xwe yên ezîz ji dest bide.

Hertim di hişê wî/wê de ev gotin derbas dibin: „heke tiştek bê serê bavê min, heke tiştek bê serê dayika min“.

Dema ez zarok bûm, hertim ji vê ditirsiyam ku bavê xwe ji dest bidim. Her şev dema min serê xwe datanî ser balîfa xwe, min dua dikir ku tiştek neyê serê bavê min û mirovên min. Beşek mezin a şevê, min dua dikir. Xewa min nedihat, te digot qey dema ez dest ji duakirinê berdim, tiştek ê bê serê wan.

Çi bikim zaroktî ye, derûniyeke pir cuda ye ji ya niha.

Ez û bavê xwe, her tim wek du hevalan bûn. Min hertişt ji wî re digot û hertişt digel wî behs dikir.

Em bi hev re, li ser hemû gund daxivîn, ji ber wê jî, ez xwe pir bextewar dibînin. Ez hevala bavê xwe bûm, hertiştê xwe ji min re vedigot.

Min jî, jê re vedigot tiştên xwe, em dikeniyan û hinek caran jî digiriyan.

Bavê min, seknek wî ya hişk hebû. Lê dilê wî pir nerm bû.

Her çiqas li malê henek nekiriba jî, lê henek û espiriyên ku dikir, di demek kurt de digihîşt guhê me. Niha jî, hinek henek û gotinên wî li ser zimanan digerin. Di her mijarekî de, gotina wî hebû. Pir bi kevneşopiyan ve girêdayî bû.

Dema ez zarok bûm, min girêdana wî bi kevneşopiyan, zêde qebûl nedikir. Ez gelek caran, hêrs dibûm û min digot, çima bavê min wiqas dikeve derdê milet. Lê niha ez dibînim ku ew di gelek mijaran de bi heq bû.


Min pir hez dikir digel bavê xwe bigerim. Wî jî hez dikir min digel xwe bibe. Em bi hev re diçûn Enqerê, Antalyayê û gelek bajarên din. Di nav rê de, teyiba erebê venedikir, digot ”teyiba min tu yî”.

Ji destpêkê heta dawiyê, tenê sitrana ”ey dîlberê” bi min dida gotin. Dengê min jî zêde xweş nebû, lê ji wî re xweş dihat. Tê bîra min, carekê, em bi hev re çûbûn cihekî dûr. Min di riya bi hezaran km de, tenê yek stran got. Min di dilê xwe de got, ”Ev dîlber ki ye gelo, ez wê bigirim ez ê porê wê verom!”. Yanê min wiqas ew stran gotibû!

Heke xizmek we yan jî kesekî we, dest bi karê ku qet nekiriye, bike, ez ê bêjim bitirsin.

Tenduristiya kalkê min pir baş

www.arsivakurdi.org



Sûretek ji xortaniya bavê min.

bû. Tu pirsgirêkek wî yê tenduristiyê tune bû. Di jiyana xwe de, qet mûz nexwaribû, heke tu li ber jî bigeriyayî, dîsa nedixwar. Min rojekê dît, kalkê min, li salonê, mûzên ser maseyê dixwe. Kalkê min ku heta wê demê, devê xwe nedabû mûzê, wê rojê 4 mûz xwar. Ez mat mam, min xwe negirt û jê pirsî, "o kalo, çi bû, te xûyê xwe guherî?". Ew tenê dikeniya. Mixabin, wê şevê, di hemamê de, xwînrijiya mejî derbas kir û çavên xwe li jiyanê girt.

Min ji wê rojê ve ji xwe re got, "heke kesekî tiştekî ku heta wê demê nekiribe, bike, nêzîkî mirinê bûye."

Sala 2002an, li Enqerê, em li pişûya xwe ya salê de bûn. Apê min Cevdet Kayhan jî ji gund hatibû. Bavê min ez hildam got, "Em ê bi apê te Cevdet re bigerin."

Ez pir ji geriyanê hez dikim. Ji ber ku bavê min ev taybetmendiyê min dizanîbû, bi ku ve çûba, ez jî bi xwe re dibirim. Ji xwe ez hertim amade bûm. Dema behsa geriyanê dibû, min zû solê xwe li pê dikir û amade dibûm.

Em wê rojê derketin derve. Hinekî li nav çarşiyê geriyan, me xwarin xwar. Piştre, bavê min em birin pastexaneyekê. Min dondurmeyeke tevlihev xwest, bavê min baqleve û apê Cevdet jî qadayif.

Min him dondurma xwe dixwar û him jî, li bavê xwe dinêrî. Dema min dît bavê min baqleva xwe xelas kir û carek din jî xwest, ez mat mam. Wê demê, dilê min qetiya. Ji ber ku bavê min, tu carî porsiyonek baqleve xelas nedikir, niha jî porsiyona duyem dixwaze. Ez fikirîm gelo çi diqewime.

Wê demê, mûzên ku kalkê min xwaribû, hat bîra min. Dondurme ji gewriya min neçû xwarê. Ez tirsiyam gelo bavê min ê bimire û min di dilê xwe de got, „towbe, towbe, Xwedê neke, Xwedê neke".

Ez tenê carekê tirsiyam. Du porsiyon baqleveyê ku bavê min xwarî, wek fîşekê di hişê min de çik bû. Min dikir nedikir ev ji bîra min nediçû.

Piştî çend rojan, pişûya me xelas bû. Em dîsa vegeriyan Danimarkayê.

Bavê min pir dikuxiya. Doktor ji wî fîlma rontgen girt. Piştre ji bavê min re gotin bila biyopsî bibe. Encama biyopsiyê, 17ê meha 9ê hat. Doktor

www.arsivakurdi.org

wiha got, „Tiştek ji destê me nayê, tenê mehek jiyana wî maye.“

Ez bi bavê xwe re çûm nexweşxanê. Doktor ji wî re jî gotibû. Bavê min li çavên min nihêrî, min nekarî pêşiya hêsirên xwe bigirim. Min nikarîbû tiştekî bêjim. Ma mirov dikarîbû çi bêje. Heta niha jî, nihêrîna wî tê bîra min. Nihêrînek wisa bû ku dema herî bêrehm a jiyanê didît û nedixwest vê bide ferqkirin.

Bavê min ji wê demê ve, 9 mehan jiya. Me qet wek nexweşekî lê nedinêrî. Dema kar zêde dibû, gelek caran me jê re digot, ”Bavo, kar pir e, were alîkariya me.”

Lê her roj, me digot gelo bavê min ê kengê bimire, 9 mehan xew neket çavên me. Dema dengê sîrena ambulansekê dihat, em li dû wê direvîn û me digot, gelo termê bavê min tê de ye.

Xwedê vî derî nîşanî tu kesî neke.

Bavê min, jiyana xwe da bo ku zarokên wî jiyaneke xweş bijîn. Her çiqas hez nedikir li Ewropa bijî, lê ji bo ku em xoşbext bibin, li welatekî ku qet jê hez nedikir, rûnişt. Em ji bo wan tiştên ku ji me re kiriye, minetdarê wî ne.

Bavê min, bidil û dilovan bû. Çend riste nikarin wî binînin ziman. Hêvîdarim nivîsandina pirtûkek derbarê wî de mumkun bibe.

Jiyan pir kurt e, hezkirina xwe ji hezkiriyên xwe dereng nexin. Dibe ku sibe, pir dereng bimînin...

Neh meh in, min ne xew e û ne şev e
Bavê min î kibar ketî nexwaşiyeka bêderman e
Şev û ro li ber Xwedê digerim ka merhemê
Tişt nayê ji destê min, bavê min li ber çavên min dihele
Welle ez navê mirinê li bavê xwe helnadim
Neh meh in min qêmîşê nekir
Negot bavê min î nexweş e
Welle dilê min kûrbûyê kelî
Dîsan jî min hemêz nekir
Min nizanî umrê bavê min kut e
Roka ber mirinê min xuya seklanî bi destê xwe pa kir
Ez a cahîl bûm, bê heş bûm, min fahm nekir
Wexta Memedî Hecî got: Nesrîn, can çing î şirîn e!
Ar ketî dilê min kûrbûyê min zanî umrê bavê min tune
De hûn bên cîran û hevalno
Ez a çi bikim ez ê vî dilî şewitî bi çi axê sar bikim
De mezkî demî spî çavên kesik ji bîra min nare
Bejna delalî ku ketiye erdê çing ji bîr bikim.

www.arsivakurdi.org

Kurdên Xorasanê û rêya Kurdistanê

Şêrko Cîhanî

Gava ku ji bo cara yekemîn min kurdên Xorasanê nas kir, ez zarok bûm. Texmîn dikim ku temenê min nêzî 10 salî bû. Ez û hejmareka din ji zarokên xwendekarên bajarê Mehabadê ji rojhilatê Kurdistanê ji alîya mektebê ve çûn bajarên Meşhed, Tebes, Şîrwan û Quçanê ku li rojhilatê Îranê ne û nêzî sinurên dewletên Efxanistan û Turkemenstanê ne (Wê gavê Yeketiya Sovyet hebû). Li vê derê ji bo 2 heftan em li ordugeheke taybet a zarokan diman ku ji hemî bajarên Îranê bi sedan zarok hatibûn. Ji bo cara yekemîn min di jîyana xwe de li vê derê di şanoyeke komîk de rol leyîst. Gelek mamosta jî hatibûn. Di nava mamostayên ku bi me re daxfîn yek hebû xelkê bajarê Meşhedê bû. Berçavik di çavê wî de hebû û bejna vî bilind bû. Ew mamosta gelek ji zarokên kurdan hez dikir. Germbûna wî bi me re ji min re bû pirsyar û min jê pirsî:

– Sebeb çi ye ku tu ewqas ji me kurdan hez dikî?

Wî got:

– Ji ber ku ez jî kurd im!

Em bi bersiva wî re şaş man. Me got:

– Eger usa ye çima bi me re bi kurdî naaxifî?

Wek hertim bi rûyekî xweş û bi ken bersiv da me û got:



Dîmenek ji koçberiya koçerên Xorasanê.

www.kurdiyakurd.org



Dîmenek ji jiyana kon û reşmalên koçerên Xorasanê.

– Ji ber ku ez kurmanc im û hûn soran in. Belkî hûn ji axaftinên min fêm nekin. Her çiqas şerm e ku kurdek ji kurdekî din ji ber mesela dîyalêkt fêm neke, gerek em hemî zarave û dîyalêktên hevdu bizanbin. Lê kurmanciya me jî piçkek ji kurmanciya Urmîye û Amed û herêmên din yên Kurdistanê cuda ye. Ji ber ku em kurmancên Xorasanê ne!

Min got:

– Ma li eyaleta Xorasanê jî kurd hene?

Mamosta vê carê bi xemgînî kenî û got:

– Em ew kurd in ku mexabin ji alîyê kurdên Kurdistanê ve hatine jibîrkirin.

Ji bo çend deqîqe bêdeng ma. Gelek zarok di salonê de bûn ku pir cara dengê wan dihat, lê bi bêdengiya mamosta re ew jî hemî bêdeng man. Tiştekî ecîb bû, rewşeke pir bi tesîr. Ken li ser lêvên mamosta bû, lê di çavên wî de hêsir kom bûbûn. Piştî çend deqîqe bêdengî bi gotinê xwe re berdewam bû:

– Em bi sedan sal in ku ji Kurdistanê hatine koçandin. Bi sedan hezar kurd li Xorasanê dijîn. Li gelek bajarên wek ”Şîrwan, Qûçan, Deregez, Meşhed, Tebes û... hwd”. Gelek sitranên me yên kurdî û gelek efsane û hekayetên xwe me ji Kurdistanê bi xwe re anîye û heta roja îro me ew parastine. Me nasnameya xwe hîn hunda nekirîye. Dihol û zorna me, cilê kurdî yên jinan û dîlanên kurdî her bi me re ye. Em kurd in û dîrokeke me ya xweş û nexweş li ser wê axê heye. Nêzî çarsed sal in ku desthelatdarên Îranê bi darê zorê û ji ber ku me li Kurdistanê li hember wan şoreş kiribû, piştî ku şoreşa me şikestin, fermana awarebûn û koçberiya me ber bi Xorasanê dan.

Bi wî awayî şîn xistin hundurê dilê dayikên me. Em bi hezaran kîlomêtir ji Kurdistanê dûr xistin û rê nedan ku em vegerin welatê xwe. Eslê me ji herêmên wek bajarên Urmîye, Xoy, Mako, Wan û cêhên cur bi cur yên Kurdistanê ye. Lê tevî hemî şîn û nexweşiyan li Xorasanê, qehreman û mêrmezinên me jî dîsa çêbûn. Kesên wek Reşîd Xan li Xorasanê serî hildane û pîştî leşkerên Îranê şikestine. Dîroka me wek hemî kurdan tijî şîn û şahî ye. Komêdî û tirajêdî ye. Em welatdarên bê welat in!

Dema ez vegerîyame rojhilatê Kurdistanê, min peywendiya xwe bi wî mamostayê re ku navê wî aniha nayê bîra min û tenê dizanim ku doktor bû berdewam kir. Gelek name bo min dişand û min jî wek zarokekî ku bi nameyan pir kêfxweş dibûm bersiva wî dida. Peywendiya me nêzî salekî berdewam bû, lê nizanim sebeb çi bû ku êdî name yên wî nehat.

Di heman demê de tevî ku ez zarok bûm jî, gelek caran diçûme mala xalê xwe û li odeyeke mezin a mala wan gelek



Dotmîreke ji kurdên Xorasanê tev cil û bergên xwe yên kurdî.

www.navakurdi.org

kîtab hebûn ku min dixwend. Hinek ji wan kîtabane ku qet ji bîr nakim, xwendina wan li gor temenê min gelek zû bû. Wek mînak kîtabek hebû ku bi nêrîneke zanistî û mîtolojîk li ser dîn û olan hatibû nivîsandin û gelek keyfa min pê dihat. Yek ji wan kîtabên din ku ez qet nikarim ji bîr bikim, kîtabeke 3 bergî bu bi navê " Koçberiya dîrokî ya kurdan ber bi Xorasanê ". Ew kîtab ji alîya nivîskarekî kurdê Xorasanê bi navê Dr.Kelîmullah Tewehûdî hatîye nivîsandin û gelek bi nirx e. Bi rastî bo min balkêş bû. Bi taybetî ku ez bi xwe jî çûbûme herêma Xorasanê û min bi çavê xwe ew ji nêzîk ve dîtibû. Ez pir tiştan li ser kurdên Xorasanê bi rêya wê kîtabê fêr bûm. Tiştê ku Kelîmullah Tewehûdî kirîye pir balkêş û zanistî ne. Ew şîîar nedaye, belkî belgeyên dîrokî kom kirîye û rastîya dîrokî ya koçberiya kurdan û jîyana wan li Xorasanê wek xwe nîşan daye. Piştî çend salan min zanî ku mexabin dewleta mirovkuj a Îranê Kelîmulla Tewekûlî ji ber nivîsîna wê kîtabê û hejmarek kîtabê din girtîye û di zîndanê de îşkence kirîye!

Gelek sal derbaz bûn û ez bûm ciwanekî nêzî bîst û çend salî. Min tevî hevalên xwe serlêdana şoreşgerên kurd li çîyayên Kurdistanê dikir ku henek ji wan hîn di şoreşê dane û hejmarek ji wan jî mexabin şehîd bûn. Di serlêdanên ku min li çîyayên wek Qendîl dikir, min gelek şoreşger dîtin ku li bajarên cûr bi cûr wek Mehabad, Kirmanşan, Qamîşlo, Efrîn, Amed, Mardîn an jî Stanbûl û Konyayê hatibûn. Lê di nava wan de min ciwanên kurdê Xorasanê jî dîtin. Ciwanên ku ji bo rastiya nasname,



Mistek ji xort û zarokên kurdên Xorasanê tev şahr û cil û bergên xwe yên kurdî.

www.sivakurd.org



Awur û tevgirêdana bûkeke ji kurdên Xorasanê.

dîrok, welat û azadiya xwe hatibûn.

Herweha di destpêka salên 2000î de li bajarê Ûrmîye û di rojnameyeke kurdî de, min wêneyekî pîrozkirina cejna Newrozê ji aliyê kurdên Xorasanê dît ku bi rastî pir bi wî wêneyê şa bûm. Di demekê de ku pîrozkirina cejna Newrozê li hundrê rojhilatê Kurdistanê bi awayekî fermî qedexe bû û dewletê nedihişt ku kurd li hev bicivin û bi agir vê rojê pîroz bikin, li Xorasanê û li herêma Deregez, bi hezaran kurd agir pê kiribûn û bi cilê kurdî û rengên kurdî û dîlanan, Newroz pîroz kiribûn.

Ez dizanim ku vegerîna bi sedan hezar kurd li Xorasanê ber bi Kurdistanê qet ne mumkîn e. Kar û barê wan û her tiştê wan êdî li vê derê ye. Lê girîng ew e ku ew eslê xwe, ziman û nasnameya xwe ya resen hunda nekin û bi rêya ku xwe bi rêxistin bikin, li çand û nasnameya xwe zêdetir xwedî derkevin, wek çawa heta îro jî piştî sedan sal ew nasname parastine. Lê ez bawer im ku gelek ji wan jî hîn dilê wan bo vegera ber bi hembêza dayikê lêdixe û dengê teyrên baz hertim di gohên wan de ye. Bi taybetî ku îro radyo û TVyên asmanî yên kurdî jî li pir cîhên cîhanê bi rêya setelaytê diçe nav malan û kurdên Xorasanê jî bi rêya pencereyeke usa baş ve careka din dikarin dîmenên welatê xwe, dayika xwe bibînin. Ûsa ciwanekî kurdê Xorasanê, li hespa xeyala xwe ya wek hespê Reşîd Xanê qehreman siwar dibe û ber bi zozanên Kurdistanê dajo. Dema firînê hatîye ne? Bazên hêsîr balên xwe vedikin dîsa...

15.04.2011

www.arsivakurd.org

KEFENÊ REŞBELEK

li temenê qambax
lûfikên kul û xeman dicûm
û bi axînan re dadiqurtînim
xeyalên xwe yên koçber
dispêrim konê gerokan
hest û ramanên tewişîn
motorê aşê bedena dilê min in
pêlên çema dîn û har
xezeba salên talanbûyî
li ser birîna kezeba min
vedireşîne
lingên tevzînok
ji pêpeloka hezkirin û bêrîkirinan
şemitîn û ketin xwarê
bêhêvîtiya min
mîna bizmarê dawî
yê di darbestan de
hatî kutandin e
rengê xewnereşkên min
xumrî nin
bextreşan
zencîra îxanetê li rodikên şadiyan xistin
tahma şerbeta min tehl kirin
kêf û aramî
di herika rûbarên çaxan de
xeniqîn
awirên deryayên westiyayî
di qalikê mîdye de
li ser sîngê min
xilmaş dibin

www.arsivakurdi.org

di bin şewqa heyva çardehşevî de
çermê şevên reştarî yên xayîn
diqeşirînim
tevî neynokên giyanê pûç
êş û kovanên xwe jî
dorpî dikim
li şilûpila meha sibatê
li peşkên baranê siwar dibim
û merhemeta îlahiyan
dibarînim
ji gulîstana demên rabirdû
bêhna bîranînên şoreşên têkçûyî
berhev dikim
bi kartûka zimanê helbesta xwe
mêjiyên zengarî
dibiriqînim
ez
li valahiya gerdûn
kesera lehiyeke dilbirîndar im
li bêxewiya rojên stewr
serkêşê karwanê çolistanên azad im
ji teşqeleya cîhana derewîn re
fotokopiya jana eşqa dilê pîr
dihêlim
bi kefenê reşbelek
xwe diavêjim tor û bextê axa pîroz

Xizan Şîlan
2010-03-03, Stockholm

www.arsivakurdi.org

NE BES E

Evîna te ya min
Bi sewdaya xwe meyandî
Birîna te ya min
Bi germiya agirê Newrozê kewandî
Dîroka te ya min
Bi xwîna keç û xortan xemilandî
Qelendê te yê
Ne bes e

Bav û kalên min
Li ser axa te kon vekirin
Ji bo parastin û azadî ya te
Keç û xortan
Bi bisk û guliyên te yên zer de
Xwe dardakirin
Ne bes e

Ev çend sedsal in
Ji bo te di în û çiyan de
Li hember dijmin
Dest bi çekan sîng vekirin
Ji bo rizgarîya te
Çend caran ava Dîcle û Feratê
Bi xwîna xwe sor kirin
Ne bes e

De bêje Dayîka Delal
Kîngê dest bidî me
Kîngê pêsîrên xwe yên spî
Dirêjkî lêvên me
Bes e înat neke
Hetanî azad nebûyî
Min bin ax neke
Bes e

Mem Xelikan

www.arsivakurdi.org

ŞÎÎRA KERÎ

bayê xerîbîyê ketîye nav porê min
bihimcirê çend xewn bê te raketin
va xewa çend meha ye
pê xeyalê bejna te xew de çûye…

porê te yê reş qirika min piçikîye
ez bê nefes im
nefesa min dilê te de ma ye
devê min de qise dernêhin
zimanê min li ser navê te maye…

sibekê zû de
xewekê birbang
ro fedî fedî hildikşe ezmanan
dilê min diqelişe…
xeyalê te ber çavê min re tere
porê te ji min re bûye rêya şawbûnê
kenê te de vedixwim heyatê
çawê te de her dem ez dimiçiqim…

ro paş newalan de wenda dibe
şev mîna mêrekî çê xuya dibe
dadikeve ser gundan
dadikeve ser bajaran
bajar dikevin xewa mirinê
hîv ji wan re barge dibe
ez tenê dimînim payî…

www.arsivakurdi.org

berf cemidîye li ser porê min
enîya min
mîna erdekî bê av qelişî
roj li ser vî çermî temirî
were, şevê çavên min de bixwîne
xeberê bide bayê reş
ma bayê qurbetîyê nav parsîyê min de derxîne
belkî wê wextê
dilê min li ser bejna te digere…

sîya bejna te daketîye ser çavê min
bijangên te bûne xençer
biruyên te bûne gurz
lêdixine li ber derîyên dilê min
histêrikên min dadixine li ser xwîna min…

zindarê giran bide li ser dilê min
qurbetîyê ji bedenê min de xerîb bêxe
terîbûna şevê çavê min de wenda bike
ji min bawer bike
ez ne dîn û gêj im
ez ji evîna te re dengbêj im…

Dilkeştî Kêfkur
gulan, haziran, 2007
Maraş

www.arsivakurdi.org

PATÎKA

dema ku
tu
li ser rîya patîka dimeşî
ferq neke
şev û roj
jêr û jor
biçûk û mezin
bala xwe bi zindîya da
nêçîrvanî tenê zik têr kirine ke
li şopan binêre
rîyê te ê dirêj e
berda
ma kerwanên gêreyan
bi keyfî xwe derbas bibin
esaletê li hevdu parva bikin
li kevîyê rê
gulên çilmisî ê bêmêvanên
gulîyên daran ê bêdeng in
me xwe
ji zimanî demsalan
bi dûr xist
û berîyên xwe dan dîwaran
em ê dor alîyê xwe
bi ramusan dixemilîninî
û bi tenê rêwitîyê dikinî.

Seyfi Doğan

www.arsivakurdi.org

Cenga bi hotê berfê

Nuh Ateş

Xezîneya zimên ji zar û zaravayên wî peyda dibe. Heyî û dewlemendiya zimên di zar û zaravayên wî da veşartiye. Bêî wan ziman xizan dibe. Eger meriv serîyê xwe bi zar û zaravayan cîhwarkî û bi nivîsandina bi bandora wan neêşîne, hîngê ev dewlemendiya dernakeve meydanê. Ew ê bi ber bayê bîrbûn û wendabûnê keve. Ji bo vê, nivîsandina serpêhatî, bîranî, çêrok û lîstikên bi bandora zaravayên cîhwarkî muhim e.

Zemanekî, li Elmanyayê nasekî min î Kurdistanî ji min ra gotibû ku di kurmanciya cîhwarê ku ew lê hatiye dunyayê da, navê heywanê ku bi tirkî jê ra „kokarca“ û bi elmanî „stînktîer“ tê gotin, tuneye. Meriv dikane „Stînktier“ wekî heywanê bibîhn yan jî heywanê ku bîhn jê tê wergerîne kurmancî. Navê vî heywanî li gorê çend ferhengên kurdî, nimûne yên D. Îzolî û Z. Farqînî „Bokenge“ ye. Li gorê ferhenga Enstîtuya Kurdî ya Frensa jî navê wî „Fisteq“ yan „Fisû“ ye. Lê di kurmancîya Anatolîya Navîn da, nimûne di kurmanciya gundê ku ez li hatime dunyayê, Xelika (Karacadag-Kulu-Konya) da, navê wî, „Bîhngenî“ ye.

Nimûneyên wengna ne hendik in. Mînak, li Xelika vi gogê (top) ra dibên, „hot“. Gerçî niha, peyva top ketiya nav zimanê Xelika û şûn li pêyva hotê teng kiriye. Li wir jî, êdî pîrtir top tê gotin. Peyva gog di kurmancîya Xelika da jî heye, lê ne bi meneya hotê yan jî topê. Li wir, ji hevîrê ku sewa lêxistina nanê sêlê tê qilotkirin ra dibên, „gog“. Di ferhengên kurdî da, peyva hot qet derbas nabe.

Di xortaniya min da, em bi hotê ço, hotê niga û hotê berfê dilîstin. Me hot bi xwe çêdikirin. Me parçek caw yan çerm tijî paç û pûç dikirin û ew rind diavandin û der û dor lê didurîn yan jî bi sênaxan girê didan. Paşê çêşîdên hotê pir bûn, hota lastîkî û yên din îcad bûn.

Di vê nivîsê xwe da, ez ê qala lîstika bi hotê berfê bikim. Hotê berfê, navî li ser e, ji berfe çê dibe. Berfê ku hev û du rind digre, berê di navberê her du destan da dikin gog û paşê bi her du destan wê dikin navberê çokan û bi vî avayî digûvişin. Carna dirêj, hetanî ku av jê dirije digûvişin. Hîngê hot pît, mîna hesin dibû. Weqas pît dibû, ku te pê li serî merivekî dixist, pê serî dişkeşt.

Lîstkên bi hotê berfê carna ji lîstikbûnê derdiketin û dibûn cengên bi hotên berfê di navberê xortên tax û mehelayan da. Di van cengên bi hotê berfê da, tevgera sosyal, eşîrtî, qebîletî û malbatî jî rolekî binperdeyî dilîstin. Nimûnê, di zemanê

www.arsivakurdi.org

xortaniya min ra, li Xelika, sewa cengên bi hotê berfe gund dibû sê meheleya: Meheleya juri, meheleya jêri û meheleya malê bêrê. Vi meheleya juri ra, meheleya torina jî digotin. Li vê meheleyê qebîla torina mezin û bi hukim bû. Torin ê hingê qelaw (dewlemend) bûn. Di pêşiyê da, torinan serdariya gund kirine û ew mîna esîlzadeyan dihatin hesibandin.

Vi meheleya jêrî ra jî digotin, meheleya helaca. Li vê meheleyê qebîla helaca mezin û bi hukim bû. Zemanek hat, helacan îdara gund vi dest xwe xistin, mixtarî û şahredarî demeke dûr û dirêj di dest wan da ma. Di navberê meheleyê juri û meheleyê jêri da, di bin nave qebîletiyê da, reqebeteke sosyal û civatî hebû û pir û hendik hîn jî heye. Huro jî li Xelika di helbijartinên şahredarî û mixtariyê da qebîletî li pêş e. Meheleya sisêyan jî meheleya malê bêrê bû. Li vê meheleyê jî nifusa qebîla malê bêrê pir bû.

Helbet, li her sê meheleyan, qebîle û malbatên din jî hene. Xortên ku teve cenga bi hotê berfê dibûn, ne tenê ji van qebîleyan yên ku min li jur navên wan heldane bûn. Eksê vê, ji serdar, şeg û wêrekên vê lîstikê pirê xwe ê ji qebîle û malbatên din bûn.

Sîya reqebete sosyal, civatî û qebîletî dadikete ser lîstika bi hotê berfê ya di navberê xortên meheleyan da jî. Lîstika bi hotê berfê dibû cenglîstik. Dibû cenga qebîletî, qehremanî, şan û şerefa meheleyan jî. Di rastejîyanê da her lîstikekê mene û funksiyonên xwe hene. Ji zaneyên vê mijarê hene dibêne, ku di navbera lîstik û jîyana real da eleqeyeke dîyalektikî heye û lîstik xwe pir caran wekî antîteza sembolîk ya realîteye dinimîne. Bi ya wana, kesê ku xwe di jîyanê da tim badide yan revok e, dikane di lîstikê da aktîv û şeg (huste) bibe. Û lîstik ji kesên han ra vê fersendê peyda dike.

Cenga bi hotê berfê yên li Xelika pir cara di navberê meheleyê juri û mehelê jêri da diqewimîn. Di van lîstikên hotê berfê da, her mehelekê cengawerên xwe yên huste wêrek hebûn. Li meheleyê jurî, veqasî ku tê bîra min, Kemalê Heskî Omar, Mehmê Rawê Xanê, Şexoyê Mistir, Kuşoyê Xanê, Osê Sadê, Hesenê Hewê Omê, Osê Îdê, Omê Elîyê Heskê, Mehmê Helîmê Xişê, Memikê Miçê Elî, Miçikê Malê Demircî, Miçikê Mehmî Karê di cengên bi hotê berfê da pir şeg û wêrek bûn. Şeg û wêrekên mehelê jêrî jî vana bûn: Ehmedê Hesî Zexkê, Osê Hemê, Hemîdê Hecê, Kemalê Osî Garê, Osê Hecî Musê, Rêşikê Elî Oskê, Hemikê Malê Elê Birê, Hesikê Şêxî Qinê. Şeg û wêrekên meheleyê malê Bêrê jî vana bûn: Arîfê Şerîfê, Kadirê Bilê, Hesenê Husî Gupinê, Mehmê Gencê, Mehmê Gozelê, Milê Omî Heskwîrê, Mehmê Husî malê Bêrê, Kazimê Hesenî Goçmana, Ûsikê Hesî Kaşo, Hesoyî Kewê Besê, Kemalî Şêxî Gulê Alo.

Li meheleyê juri, Kemalê Heskî Omer, Omê Elî, Kuşoyê Xanê, li meheleyê

www.arsivakurdi.org

jêri, Hemîdê Hecê, Osê hemê, Ehmedê Hesî Zexkê, Osê Hecî Musê, Reşikê Elî û li meheleyê malê bêrê jî Hesenê Husî Gupinê, Kadirê Bilê, Mehmê Gozelê şegtirên vê cenglîstikê bûn û serdariya xortên meheleyên xwe dikirin.

Xortên her meheleyê serdarên xwe û berdestkên wan hebûn. Mîna di cengên sahî da, ew di nav xwe da li ser birêvabirina cenga bi hotê berfê, rêzkirina cengawerên xwe, tektîk û stratejiya cengê, tevdarîkiya malzemeyan û wezife parvekirinê dişewirîn.

Meşandina cenga bi hotê berfê di çend merheleyan ra derbas dibû. Di serî da, xortên meheleyekê kome ser hev dibûn. Wan di nav xwe da roj, wext û meydana ku cenga bi hotê berfê lê biqewime nîşan dikirin. Dûv ra, wan şandeyek dişandin meheleya ku ew dixwazin bi va cengê bikin. Şande xewera roj, wext û şûna cengê digihîhande xorten meheleya dijber. Li Xelika, pir cara meydana li pêş goristanê gund û meydana li pêş malê Utê ya ku huro konaxa belediyê lê hatiye çêkirin, wekî cîhwarê cengê dihatin bijartin.

Her alîyekî di derheqa planên dijberîyê xwe da hayadarî berehev dikirin. Ji bo vê, wana cend alîgirên xwe wezîfedar dikirin.

Sê yan çar xort dibûn hotçêker. Wana li meydana cengê hotê berfê çêdikirin. Carna, wexta ku cenga xortên meheleyan tûj dibû, evarê di ber roja cengê da, wan hot çêdikirin û ew dicemdandin û dora dinê rojê dibirin meydana cengê. Çend xortên din jî hot digerandin. Wana hot dikirin tûrik û destmalên gir û kûj bihev va girêdayî û dibirin li meydana cengê digihandin serdar û cengawerên taxima xwe.

Wezifeya çend lîstikvanan jî parastina serdariya koma xortên meheleyê bû. Wan di meydana cengê da, xwe didan her du alîyên serdar û berdestkên wî. Wezîfeya wan ew bû, ku bi barandina hotên berfê bi ser serdar û cengawerên hêla dijber da, rê li ber hemle û hêrişên wan bigrin.

Hen cengawerên nîşandar li meydana şer, di cîhwarên stratejîg û di kûnc û kendalên veşartî da dihatin bişûnkirin. Wan ji vêhiska da, bi lez û bez, bi wêrewêr û arear geh ji perê rastê û geh ji perê çepê da, êriş dibirin ser dijberiyan û bi lez jî xwe bi şûn da dikişandin. Bi van êrişên xwe, wana dijberiyên xwe ditirsandin û rêz û nizama wan tevlihev dikirin. Bi vî avayî, wana ji hemle û hucumê mezin ra rê vedikirin.

Carna, wextê ku ceng dirêj diajot, gavekê ji bo vihêsînê navber didan. Di wê navberê da, her du alîyan birîndarên xwe derman dikirin û aligîrên xwe sur dikirin. Serdar û fermandarên wan li ser gav û tektîkên nû dişewirîn. Li dawiya cengê jî serdar û cengawerên her du alîyan, ji bo cengên nû, encam ji cenga rabirtî derdixistin.

24.04.2011

www.arsivakurdi.org

Kal

Seyfi Doğan

Germa hevinê. Germa rumê rutik. Germa deşta Axylonê. Xwezayê (Tebiatê) dîsa hunî bîrê min ku ez parçek ji wê me û ez ne xwedîyê dunê me.

Ey însan! Were rê! Were xwe! Pozbilindîyê meke! Hop Elo! Di rêzê keve! Cîhê te î li nav zindîyên dunê ye! Ferq neke, çi însan, çi heywan. Here ku tu xwe mîrzayê dûnê bizane. Ez dê ê xwe bikim û te hewcîyê parçek sîyê û dilopek ava sar kim.

Sibê zû ji xewê rabûm. Xanîyê ji hêsin û bêton bûbû hemam. Kele kela havînê serî sibê zû dest pê kiribû. Germeke intensîv û konsantre. Tîrêjên rojê wek kozîyên êr dibarîn. Mîna ku ezî li ber zoweke devjevkirî bûm.

Ava çayê da ser agir û sifra xurînîya dagirt. Ji teştê bi şun da bi lezûbez bazda derve.

Di kêleka mala min re kerîyek pezî ku ketibû qûyê li nav malan belev dibû. Dengên ziravên zengilan wek senfonîya orkestrayekê doralîyên xwe şên dikirin.

Dixwazim, bibînîm, tam bikim,bîhn bikim, hîs bikim û bihibîzim!

Erê bihibîzim! Ji her alîyan da, zimanê ku ez bi pênç hîsên xwe fehm dikim û xwe pê îfade dikim bihibîzim. Ez î dixwazime, dengî kolan û kuçanî bi hezar çeşîdî ye bibihîzîm! Dengî kalan û pîran. Dengî keçan û bûkan. Dengî zarokan û cîwanan. Dixazime, melodîya zimanî zindîyê ku wek bexçekî gulayî bi hezar rengî ye guh bi ser dim.

Berjêr, berve hundirî gund giran û giran daketim. Ezî li nav gund, bi pêya gerînê hez dikim. Li bin lingên min erd û li ser serî min ezman. Bi kaînatê re dibim yek. Xwe li mal hîs dikim.

Mal, ji bo min cîhe ku lê hatîyî dunê ye. Wek peyva almanî ***Dasein**** hebûna min e! Nasname min e! Hîsên li bahevdu dida min. Mal cîhek e ku zarokatîya însanan lê derbas bûye. Jîyanek û demake bêkexû û kasawat, dema zorokatîyê. Demake ku bêgunah û ji miriniyê dûr.

Eger her pênç hîsên min bi hev re û di eynê demê da kar nekin, jîyan bi min xizan û bi tirs tê. Loma, ezî lingên xwe ji erdê nebirim.

Mal, bes ne xanîyê ku însan têda dijîn û cîhekî cografîk e. Mal, qeytenekî ruhî ye. Hîseke ewleyî ye. Mal, bihev-

www.arsivakurdi.org

rebûyîn û nasname ye. Ew jî insanan bextewar dike.

Mal, zimanê dayîkê ye. Bi zimanî dayîkê, merî tamê ji kilaman, henekan û eşqê heytene. Li cîhên ku zimanî dayîkê tê dengkirin însanî xwe emîn hîs dike û bi xwe bewarîyêke bilind çêdibe. Bi zimanî dayîkê însanî xwe baş ifade dike.

Li mal, însan derdora xwe nas dike. Mal, mensûbbûyîna grupekê û cîhêk î ye. Mal, girêdayê mîrasê kulturekê ye. Ew mîrasê şexsan bi kokên xwe ve digîne hevdu û nasname wan pêş ve dibe. Îsanan ji bêkokîyê û ji netuştiyê diparêze. Kultur û jîyana merîyan qelav û fireh dike.

Ortalixê xewle ye. Heta kanîya Malî Şêxê rastî kesî nehatim. Kanîya Malî Şêxê bi hezaran hevpara serpêhatîyên min e. Lê kanî îro li cîyê xwe tune. Cihê kanîyê guherandin û tarîxek wenda bûye. Bi hezaran, însanan bîranîyên xwe wenda kirin.

Şunê kanîyê wextê ku merî dibîne, qeytaneke serpêhatiyê ji nişke ve çênebe. Li ser riya min, piranîyê xanîyan ê nu hatine avakirin û doralîyê xanîyan ê bi heriman hapis kirine.

Li ser rê, rastî kalekî hatim. Kalekî sipî û şuştî. Tizbîya wî ya ji nodneh tene di dest da. Kalê pişta xwe dabû diwarî xanîkî û bi qirşekî li ser axê fîgur çêdikirin. Min silava xwe dayê û kalê ez dawetî runişkandine kirim. Min xwe da kêleka kalê û li ser erdê runiştim. Kalê hal û xatirê min pirs kir bi şunda, tebaxa xwe ya tutinê dirêjî min kir. Min tebaxa wî ya titunê bi hurmet vegerand. Çimkî min nexwest berve wî cixarê bikşînim.

Kalê hêza xwe kir û giran û giran bi zarekî hesret dest bi gotinan kir û ji kalbûna xwe da behs kir:

– Kalbûyîn tengasî ye. Dunê li ser mirova teng dibe. Kalbunî tenêbûn e. Kalbûyîn xizanî ye. Dunê bi însanan şîrîn e. Ji hemsalên min pir kes nemane. Wextê ku merî kal dibe, rabirdûyên xwe yê pê hêja dibin. Ew dema, demeka bi tam bû. Merî dixwaze wê demê bi hemsalên xwe re hûne bîra xwe û tamê jê derxe. Ka li ku! A te yî bi çavên xwe dît, ezî bi tenê li ber dîwarekî me. Ez nebêm herroj lê pir caran, ezî li yekî ku pê re piçek sohbet bikim, digerim.

Wexte ku merî kal dibe, bedenî guh nade ser hiş û hîsan.

Doralîyên te yê te kal dikine. Ruhî hîng cîwan e. Wek min got, bedenî guh nade ser min. Hemberî te yî, tiştekî li yake te nebînê. Temam, wexte ku însan kal dibe însanî tê guherandin. Lê wiqas jî ne.

Dilî dixaze ku ciwan bimîne.

Wek te dît. Ezî havînê serî sibê xwe didim berrojekî. Kes hat ezî pê re deng dikim, nehat ezî xwe bi serpehatîyên xwe mujli dikim.

Dunê tê guherandin. Nanî berê li ber lingên însanan bû. Nuha ji

www.arsivakurdi.org

bo parîyêk nan, divê merî, here welatên dûr, welatên xerîp. Berê malbat gihiştikî li ba hevdu bûn. Kal û pîran zarokan xwe li mês dikir. Lê nuha! Herkesekî li derekê.

Kalê hîng şorî xwe temam nekiribû ku du balafirên eskerî di ser gund re firîn.

– Xalî te suyî xwe li ber qederê xwar nake. Xalî te! Heya ku Xwedê edî nebê temam, ez weng qolay û qolay teslîm nabim. Ezî bi dest û lingên xwe li berxwe didime. Ma Xwedê min hewcî kesî neke… Ezî dixwazime wek darê darberû li ser lingan vegerim alîyê din Li vê dunê mal jî, milk jî û manewiyat jî pewîst e.

Kalê, xanîyekî bi kerpiçan avakirî û bi nav salan da çûyî nîşanî min da:

– Ew oda bû! Oda ku mêvan lê dihatin verêkirin û civata mêran lê dicivî. Û kalê ji min re qela kultura odan kir.

– Bi teybêtî Mixtarî gund an jî kesên ku aborîyê xwe baş, xudîyên oda bûn. Zaten, mixtarî gund ji yên ku bi hayî dihat helbijartin. Odan şevên zivistanê dirêj, xweş û sivik dikirin. Piranî kal li odan dihatin ba hevdu. Ode wek mektebekê bûn. Li wir qalê hertiştekî dihat kirin. Kalan ji rabirdûyên xwe da behs dikirin. Sohbetên kur û tîr ew şevên dirêj û tarî hêse û ronî dikirin.

Kerwana erebên bûkekê derbas bû. Xortan û keçan bi peçîyên xwe îşareta serketinê nîşan didan.

Xort, li dawîya odan rudiniştin him xizmetî mezinan dikirin him jî ji kalan jîyan û zanebûn têvisîn. Serpehêtî û tecrubên kalan ji xortan re dibûn rêber. Odan, zanabûn û tecrube ji nesîlekî neqilê nêsîleki dikirin.

Dengbêj, xoca û hafiz jî li odan dibûn mîvan. Dengbêj, ji alîyê Kurdistanê dihatin. Wextê ku dengbêjek, ji Kurdistanê dihat, heweka zîz li odê hakîm dibû. Kilamên egîtan û destanên kurdan distiran.

Însanan ji hêqata Mem û Zînê pir hez dikir. Hêqata Mem û Zînê bi zarekî mîna kilamekê û bi gotin digotin. Heta serî sibê, me guh dida ser eşqa Mem û Zînê û xiyaneta Beko.

Îbramê korî ji Urfê gelek caran hat. Dengbêjan bes kilam nedigotin. Wan çêrok, heqat, qat dikirin û xeber ji cîhekî neqile cîhêkî dikirin.

Apoyê Fatê Qirê bi henek û şanoêyên xwe oda şên dikir.

Bilûrvanên wê demê gund bi gund digerîn û li oda dibûn mîvan. Xelkê gelek qimetê wan dizanî. Hesê Cucê ji Omera dihat. Millet jê re hurmet dikir. Miçî Alê Pitê ew jî ji Omera bû. Bilûrê wî pirê zîz bû.

Xoce û hafizan li odan, Quran dixwendin û li ser dîn sohbet dikirin. Bersivên pirsên dînî didan û însan bi bersivên xwe xenê dikirin. Çimkî, pir caran li dilî cemeatê deng dikirin.

Xwedanî odê, xwarin û vexwarin îkramî mîvanên xwe dikir. Wê demê

www.arsivakurdi.org

çay û qehwe gelek kêm bû. Şekir zaten nedihate dîtin. Li odan pir caran xoşav îkram dikirin. Carcaran jî hêjîr, muj û leblebî didan ber mîvanan.

Mîvanên ku ji derveyî gund hatî, wê şevê li odê radikatin û xizmetî wanan xwedanî odê dikir.

Însan î hîngê bi mefke bûn. Qedr û qîymet hebû. Tebaxê titunê li ser kilavî hiriyê xuşa ber hev dikirin. Cixarê peçandin merasimek bû. Giran û giran titun dikirin nav kaxizê û bi îtina li kaxizê belav dikirin. Wek ayînekê gelek giran û harmonîk cixare dipêçan.

Wî kalî, cîheki din nişanî min da, ew kevirî ku tu dibînî kevirê sîyarbûnê ye. Mêr li ser wî kevirî li hespan siwar dibûn.

Vê ku ez dibêm ji zûda ye. Lawên bi malbatê xwe delal, jê re canîyêk nîşan didan û guhar bi guh da dikirin. Lawên wê wextê perçem berdidan û zêrek bi perçemê da dikirin.

Li kelekî vî kevirî siyarbûnê, bîrên genim û cê habûn. Gundiyan genim û cêyê xwe, wê demê di bîran da diparastin. Serê bîran bi kayê û bi axê digirtin. Wextê ku ihtiyac dibû, ser bîrê vedikirin qasî ihtiyacê xwe heytinan û serî birê dîsa digirtin.

Havînan ku hîng bîrê boş bûn, jin di wan bîran da diketin buxê. Hundirê bîrê bi yûzerleka rêtêxistin û ser bîrê kîrîş davêtên û bi gîya didan ser. Ji bo ku hundirî bîrê germ bikin, di biroşên mezin da ava kelî dikirin hundirî bîrê. Kevirê ku li derve hatine germ kirin, dikiriin hundirî bîrê û av li ser keviran dikirin. Jinan li novê têxist ku di bin buxê kevin. Digotin, buxê ji romatîzmayê re rind e.

Kalê sohbeta xwe ya xweş berdewam kir.

– Berê gund wek nuha neyî qilêrî û gemarî bû. Binere! Herder bi şîşên plastîk û tûrikên naylonî ortalix di bin bermayîyê da kirine. Berê hertişt tebîî bû. Bermayî, ya hestî bûn an jî nanê hişîk bû. Ev jî te tawite ber kuçika an jî çûçika. Xwedê sebire bi me de. Xaniyê bi perên pir ava dikine lê doraliyên xwe pak nakine. Ava qilêrî bi ser xwe da berdidine.

Gotinên Kalê ez kirim nav ramanên kûr ... û min xatirê xwe ji Kalê xwest û ber ve bazarê çûm.

Di ber *Karacadag Kultur Merkeziy*ê da derbas bûm. Derî girtî bû. Ez î mehekê li gund bûm, min qet deri Kultur Merkeziyê vekiri nedît.

Rojê duşembîyê roja bazara gund e. Çend firoşkaran, konên xwe vegirtibûn. Çeşîdên malên wan ne gelek pir bûn. Kalîteyên tiştên ku dihatin firotin ne gelek baş bûn. Gundî li nav konan digerîn û îhtîyacên xwe temîn dikirin.

www.arsivakurdi.org

Çend întiba û rasthatinên GERA Lİ KURDİSTANA AZAD

Nuh Ateş

Ez û hevalê xwe Mehmê Hemê (Mehmet Ozkan) tevehev li 10ê meha Gulanê ya îsal çûnî Kurdistana azad û du hefteyan li wir man. Min û Mehmê Hemê zuva ye ku me hev û du ne dîtîbû. Me hay ji hev û du hewû û carna jî bi rêya telefonê li hev dipirsîn. Ez bi Mehme va hevalê hev û du yên ji berêberê da ne. Em li eynê gundî, li Xelikan (Karacadag-Kulu-Konya-Tirkîyê) yê ku li nava Anatolîyê dikeve, hatine dunyayê û mezin bûn. Zaroktî û xortanîya me bi hev ra derbas bû. Di wexta xwe da, gava ku me li bajarê Konyayê dixwand, me bi hevra mektew cihîşt û em ji bo xamxeyalan bi hevra revîyan çûn Stembula xopan. Paşê, em di eynê wextê da sewa xwandina bilind çûn Elmanyayê û li wir man. Bi hevra em teve hereketa kurd bûn û me wextekê di refên KOMKARê da xizmet kir. Huro salên me di ser şêstî ra ne û em her du jî çel sal e ku li Elmanyayê li bajarên ji hev û du dûr dijîn. Di sayê vê gera me ya Kurdistana azad da me hev û du dît û têr li ba hev man û me wexteke xwaş bi hev ra derbas kir. Me hevaltî û bîranînên xwe yên tozgirtî teze kirin. Me tim dixwazt ku Kurdistana azad bibînin û nas bikin. Dereng be jî bû nesîb. Ev çûyina me ya Kurdistana Azad a yekem bû. Lewma em ê bi kelecan bûn. Ji Duhokê hetanî Helabceyê, em li pir deran gerîyan û



M. Şefîk Oncu û Nuh Ateş.

www.arsivakurdi.org



Yakup Kaya û Mehmet Ozkan.

me pir kes nas kirin û nasên xwe yên berê dîtin. Gera me bi gîştî baş derbas bû. Em geh xenê û qirikhelkişî û geh jî matmayî û bixem dibûn. Di vê nivîsê da ez ê qala çend rasthatinan û întibayên ku vê gerê li ser min hîştiye bikim.

Rasthatineke bi kêr

Berî firînê, em li balafirxaneya bajarê Dusseldorfê (Elmanya) raste du kurdên Kurdistana Bakûr hatin. Ew jî bi eynê balafirê (teyare) diçûn Hewlerê (Erbîl). Ew kes, M. Şefîk Oncu û Yakup Kaya bûn. Min ew nas dikirin lê kêm, wekî ku tê gotin, ji dûredur va. Bi vê minesebetê me hev û du tozike ji nêzik da nas kir û bûne heval. Her du jî jêhatî û rûbiken bûn. Mîna ku li Xelika tê gotin, wekî çîk bûn. Fêdeya wan pir bi me bû. Em bi salan ji wan mestir bûn. Xwaş û temendirêj bin, wana qedra me zanîn û alkarîya me kirin û em gerandin û şûnwarên balkêş bi me nimandin. Em bi Şefîk û Yakup va li eynê otelê diman. Me dost û nasên wan naskirin. Bi rêya wan me Kek Yaşar Kaya û lawê wî Dara, Orhan, Soran, Goran, Sîrwan dîtin yan naskirin. Welhesil Şefîk û Yakup bi qedirzanî û alikarîya xwe malavayî heq kirin.

Balafirgeha Hewlerê û ewlekar

Em bi balafireke (teyare) Berlîn Airê firîn û rêwîtiya me, ji xêyrî çend kêmanîyên xizmeta di balafirê da, baş derbas bû. Em di çar seet û nîvan da sax û silemet gihêştin balafirgeha navnetewî ya Hewlerê. Balafirgeh nû û modern e û em bê mişkule di kontrolê ra derbas bûn. Sewa ewlekarîyê (emnîyet) rêwî ji balafirgehê bi otobusê berê birin cihêkî dûrî balafirgehê. Li wê derê, rêya çûyin û hatinê ya balafirgehê bi istûnên ji beton çêkirî hatiye bendkirin. Rê wer hatiye bendkirin ku yekî nêtxirab nedikanî ku bi arebeyê di wir ra bi lêz derbas bibe û ji destê kontrola ewlekarîyê bifilite. Kiryarên terorîstîyê yên ku pê li her derê İraqê bi hezaran meriv tên û hatina kûştin tên ber çavên meriva. Li pir derên din jî,

www.arsivakurdi.org

nimûne li dor û berên xanî, koşk û serayên resmî, otel û salonên navgiran û li hududên parêzgehan (vîlayetan) meriv raste bend û kontrolên ewlekarî yên bi vê şeklê tê. Li wir, li herdê cîhê kontrola ewlekariyê ya nêzikî balafirgehê em ji otobusê peya bûn. Nasê Şefik û Yakup, Goran sax be, em ji wir bi arebeya (seyare, tomofîl) xwe birin otela bi navê Darîn ya ku em li bimênî.

Welat çiqas xwaş û rind e ….

Ji xeyala milî ya kurdan çaryekek bûye rastî. Parçeyek ji Kurdistanê azad e. Li wir em raste welatekî azad, aram, ewlekar û di nav avadaniyeke gurr da hatin. Li her derê bi kurdî tê dengkirin. li ser xanî û dezgehên resmî ala kurdan hatiye lidarxistin. Xwaşhalî û serbilindiyek li me peyda dibû, wexta ku em ji alîyê polîs û memuran va bi kurdî dihatin bervêhatî (pêşwazî) kirin û me ji devê wan „bi xêr bêt“, „destxoş“, „serçavan“ dibihîstin. Ku te bi ser ra lê dinihêrî, paytexta Kurdistana azad, Hewler ji pir alîyan va mîna bajarekî mezin û modern yan jî yê ku ketiye vê rêyê xuya dikir. Bajarên din yên wekî Duhok û Silêmanî jî di vê rê da ne. Helbet di vê proseya bi lez û bez da kêşeyên (pirsgirek, problem) civakî, sosyal, aborî, sîyasî hene. Ma kêşeyên hana li ku dere dunyayê tune ne? Bi xwezayîya (tebîet) xwe jî Kurdistana azad warekî rind û xwaş e. Min xwe li wir xumalî hîs dikir. Ji xwe şoferê teksiyê, Abdirehman yê ku em biribûn Silemanî û Helabceyê, gava ku em digihêştin kontrolên ewlekariyê û polîsê aseyişê li me dipirsî, wî hema lêvedigerand û digot. „keke ew xumalî ne!“ Di destpêka gerê da, ji xwe berê strana „ welat çiqas xwaş û rind e keçikê lê lê, meriv tê da ser bilind e..! hate bîrîya min, mîna ku dibên, ew li zimanê min pêçikî. Ev rêzên vê stranê kîngê ku em raste xwaşî û rindîyan dihatin, dihate ser zimanê min, min ew carna bi dengekî bilind û carna jî bi dengeki nizm dubare dikirin. Şefîk û Yakup bi bilindî û nizmîya dengê min têdigihêştin ka ez ji sêyr û seyehata wê rojê çiqas razî me.

Ziman, famkirin û şaşmayîn

Kurdên başûr elîfbeya erebî (aramî) bikar tînin. Ji ber ku me bi elîfbeya erebî nedizanî, me nedikanî ku nivîsên bi kurdîya bi elîfbeya erebî bixwînin û fam bikin. Yanê ji av û rûyê elîfbeya erebî da em şaş diman, me digot qey em hatine welatekî ereb. Li hen deran, nimûne li ser lewheyên trefikê navên bajaran bi herfên latinî ji hatiye nivîsîn. Lê li otel, xwaringeh, xan û dukanan tenê yan pirtir elfabeya erebî tê bikaranîn. Baştir e ku li van deran li hêla elîfbeya erebî ya latînî jî bê bikaranîn. Me kurdîya bi zaravayê behdînî baş fam dikir û ya bi zaravayê soranî carina baş û carina jî kêm û şaş fam dikir. Carinan me gotinên nû yên ku me qet nebihîstî yan jî bi me ecêb dihatin dibihîstin û em pê dikenîyan. Nimûne, ji otelê ra dibên, findik. Findik bi erebî ye. Wexta ku cara yekem şoferê teksîye ji me pirsî û got, „findika we li ku ye“ em şaş man û me li dev û çavên hev mêz kir û şaş bûn ku bibên çi. Xelkê Kurdistana azad bi her du zaravayên deng dike û hev û du fam dike. Her du zarava di mektew û zanîngehan da tên bikaranîn. Di kurdîya kurdên başûr da em raste gotina „teva bûn“ ya ku şûna

www.arsivakurdi.org



Dîmenek ji Hewlêrê.

xelas bûnê tê bikaranîn hatin. Teva bûn di kurmancîya kurdên Anatoliyê da jî heye û pir caran li şûna xelasbûnê tê bikaranîn. Mîna vê, gotina „balam“ ya ku di kurdîya kurdên başûr da tê bikaranîn, di kurmancîya Anatoliyê da bi şekla „lêbilam“ cîh girtiye. Gotina „tozikê“ (hendik) jî di kurmancîya Anatolîyê da heye. Bi kevşkirina van gotinên hevbeş em şa dibûn. Li vir dixwazim bi bîr bînim ku devokê/zaravayê şêxbizeynî yê ku li Anatolîyê, li qezeya Haymanayê (Enqere) tê dengkirin nêzikî zaravayê soranî ye jî û şêxbizeynî li Kurdistan Başûr jî hene. Em fêrî gotinên din yên bi kurmancî/soranî bûn. Çend nimûne: „beyanî baş“, „çûnî keke baş î“, „qurbane to“, „gendelî“ (bertîl, rûşwet), „di katî xwe da“ (di wexta xwe da), „biru“ (here), „zor spas“, (pir spas), “keke biraderakem“, „têgihêştî keke“ (te fam kir kekê), „segbav“ (kûçikbav), „mişkule nîye“ (tişt nabe, ne xem e). Bilêvkirin û dubarekirina wan gotinan bi me pir xwaş dihat.

Qeleya Hewlerê

Hewler yek ji bajarên dunyayê kevintir e. Ew warê medenîyetên kevn e. Tê gotin ku tarixa Hewlerê zêdetirî 4 hezar salî ye. Lê li gorê hen çavkaniyan Hewler 7 hezar salî ye. Li Hewlerê, em li çend şûnwarên balkêş û tarixî gerîyan. Yakup û Şefîk jî teve me bûn. Yek ji cîhên tarîxî qeleya Hewlerê bû. Qeleyeke pir dêhşed û kevn e. Ew li ser girekî bilind bi keviran hatiyê avakirin. Dîwarên wê yên halihazir ji paşê da hatine çêkirin.



Mesut Tek, Nuh Ateş, Mehmet Ozkan, Zulkuf Xoce.

Di hundirên qeleyê da muzexaneyek heye û xan û xanî hene û hetanî demeke nêzik xelk tê da rûdinişt. Niha ev xaniyan gîşt hatine bêtalkirin. UNESCOyê dest daye ser qeleyê û bi destbisergirtina wê qele û xanîyên di zik wê da ji nûva û li ser hîmen wê yên kevntir tên avakirin. Dor û berên qeleyê bi xan û xanîyên bazara Hewlerê hatiyê peçan. Ji xanîyên bazarê kismek bi şekleke modern hatiyê nûkirin û navê Bazara Nişt îman hatiye lênan. Li pêş qeleyê parkeke lêhatî hatiye avakirin. Di nava parkê da hewzên avê û heşînayî û ji bo vêsinîyê cihên rûniştinê hene. Xelk li wira digere, vedise û tizbîyan dikşîne. Bala meriva dikşîne, tizbî kêşandin mîna mijûlîyeke mêran ya rojane tê xuyakirin. Li pir deran, li dukan û dezgehên seyar tizbî tên firotinê. Di nava van mêrên tizbîkêş da, Mehmê xwe negirt, wî jî tizbîyeke xwe stand. Em li parka Samî Abdirehman jî gerîyan. Parkeke pir fere ye û mîna baxçeyê gula ye. Di nava parkê da abîdeya şehîdan hatiye bi cîhkirin. Dûv ra, em çûn serdana Parlemana Kurdistanê. Ji ber ku em bê xeberdayîn çûbûn, me tenê li pêş avahîya parlemenê resim kişand.

Çayxaneya Miçko

Li jêr qeleyê, berve alîyê parka li pêş qeleyê çayxaneya Miçko heye. Xanîyekî kevn e. Miçko şairekî wexta xwe bûye. Çayxaneyê nave xwe ji wî girtiye. Pir kesên nas û navdar, rêwî û gerok bûne mîvanê çayxaneya Miçko. Resimên navdarên kurd yên ku bûne mîvanê çayxaneya Miçko li pewrêzên wê hatine lidarxistin. Cara pêşîn, Mehme Hemê, Yakup, Şefîk û ez tevehev çûn çayxaneya Miçko. Mixabin, Tevger û dezgehên çayxaneyê kevn in û di halekî xerab da ne, tu ê bibêjî, ew ê ji dewra Nuh da mane. Bi ya min, çayxaneya

www.arsivakurd.org



Ji perspektîfeke din ve dîmenek ji Qeleya Hewlêrê, Nuh Ateş.

Miçko mihtace nûkirin û dîzayneke modern e. Dîsa jî pir kes dihatin wê derê. Me jî jê hez kir û her roj carekê me berê xwe dida warê Miçko. Yakup bi yarenî digot, Miçko navlêkirineke bi kurdiya kurdên Konyayî ye, li tu derên din nabêjin Miçko. Va gotina bi dilê me bû, bi ser vê da, me jî digot, çayxaneya Miçko ya kurdên Konyayî ye. Li wir me Mehmet Canpolat nas kir. Ew î li Hewlerê karê hundurê avahiyan dikê. Mehmet ji xelkê Digorê (Kars) ye û nasê havalê me, Alî Aydin e. Me bi wî va demeke xwaş derbas kir.

Serdana Hevalên PSK

Di bernameya me da serdana hevalên PSK, rêhevalên min yên berê hebû. Ez, Mehmê û Şefik tevehev çûn serdana sekreterê gîştî yê PSK, Mesut Tek. Mesut û hevalên wî, yek ji wan Cemşîd bû, (ew kurdê Anatolîyê ye) bi dilgermî berve me hatin û qedr û qimeteke rind dane me. Demeke em li ba hev man û li ser mijarên cûrbicûr, li ser pirs û kêşeyên li her parçeyên Kurdistanê ketin nav sohbeteke xwaş. Mesut û hevalên wî bi me ra baş eleqeder bûn, agahdarî dan me û amadekarîya xwe ji bo xizmet û xwastekên me nîşan dan. Ji bo dirêjkirina vîzeyê jî alikarîya me kirin. Min û Mehmê jî Mesut û Cemşîd dawet kirin. Roja berî vegerîna me, Mesut û Cemşîd bo xatirxwastinê hatin serdana me. Li wir, ji bo alikarî û mîvanperwerîya bê kêmanî, spasî Mesut û Cemşîd dikim û di kar û xebata wan da serkevtinê dixwazim.

Çend heval û nasên din

Li Hewlerê, cîhê xêrê ye, me hen hevalên xwe yên berê dîtin. Me hay ji hebû ku Bilo (Bilal Görgü) bi lawê xwe û çend nasên xwe



Nuh Ateş, Mehmet Ozkan, Bilal Görgü û Kendal Nezan.

yên swedî û kurd va bên Kurdistana azad. Me lihevkiribû ku em ê li wir hev û du bibînin. Bu nesîb, me li Hewlerê hev û du dît. Bilo teve law û hevalên xwe hate otela me, lê mixabin tenê şevekê man. Kurt be jî, em bi vê hevdîtinê şa bûn û me xatira û serpêhatiyên xwe yên hevbeş û kevn bibîranîn. Bilo em hayadar kirin ku serokê Enstituya Kurd Li Frensa, Kendal Nezan jî li Hewlerê ye. Min û Mehmê Kendal berî çel salî nas kiribû û demeke kurt bi hevra karên sîyasî û kulturî kiribû. Bilo, Mehme û ez, tevehev çûn serdana Kendal. Kendal li otela Şeratonê bi dilgermî bervehatiya me kir. Qirarê du seetan em li ba hev bûn û me sohbeteke xwaş û dostane kir. Me ji Kendal bihîst ku stranbêj Fate li xana Family Mall ya li Hewlerê xwaringeh/qehwexaneyek vekiriye. Şevekê Mehme û ez çûn qehwexanaya Fatê. Fatê berve me hat û em xêrhatî kirin. Em memnun bûn û me xwe da nasandin. Demekê şûn da, mêrek hat ba me û wî jî em xêrhatî kirin û li halê me pirsî. Wî ez nas dikirim lê min ew dernêxist. Paşê em ê tê bigihên ku ew Elî Can e, birayê hevalekî min î hêja, Metîn Ayyildiz e û mêrê Fatê ye. Elî Can bi me ra eleqedar bû. Spasî Elî Can û Fatê dikim û hêvî dikim ku ew di karê xwe da serkevti bin.

Aînkawa, zewacên qedexe û Marina

Em bi Şefîk û Yakup va tevehev danê êvarê li Aînkawa, meheleya kildanîyan gerîyan. Cîh û warekî kevn, pak û avadan û bi intizam bû. Me dêra (kilîse) kildaniya zîyaret kir û bi metranê dêrê ra sohbet kir. Metran bi kurdî bi me ra deng kir. Wî qala xwaşxalî û serbestiya

www.arsivakurd.org

kildaniyên li Hewlerê kir û kar û kirinên hukumeta Kurdistanê pesandin. Li Aînkawayê jin pirtir bi ber çavan diketin û serbestir xuya dikirin. Li Hewler û Duhokê em raste dêrên mesihîyan (xiristîyanan) yên din jî hatin. Xanî, dêr û nîşanên mesihîyan ne veşartî bûn. Cîhê gotinê ye, mizgeft (camî) li bajaran Kurdistana azad ne kêm in, lê ji ber ku minereyên wan kurt bûn, ew zêde bi ber çavan merivan nediketin. Paşê, nasê Şefîk û Yakup, Orhan û Soran jî teve me bûn. Êvarê em çûn xwaringeha (restoran) bi nave Marîna ya li vê meheleyê. Bi rê da, mineqeşeyek balkêş di navbera Yakup û Soran da li ser zewaca di navbera misulman û mesihîyan da çêbû.


Li gorê heldana Soran ji zewacên di navberê mesihî û musliman ra îcaze tune û hem yasa hem jî xelk rê nadin zewacên han. Bi ya Soran zewacên han ne di cih da bûn. Va rewşa bi me pir ecêb hat. Yakup bi vê ragerî û nerazîbûna xwe aşkere kir û got, eger ew li wira bijî, ew ê guh nede van qedexeyan û ew ê rê bide ku keç yan lawê wî bi kesên mesihî ra jî bizewicin. Em gihêştin Marînayê û ji ber vê jî minaqeşe bi dawî bû. Marîna xwaringeheke mezin, modern û bi muzîk bû. Kurdî, arameyî û erebî, her sê ziman li wir di karê xizmetkirinê da dihatin bikaranîn. Xwarin û şereba Marînayê baş bûn. Tenê maseyên xwe neçê, bi panîyê pir gir bûn û ji ber vê jî danûstandina bi yê ku li amancê (hemberî) te rûniştî ra bi zehmet bû. Şefîk û Yakup ji şerebê hez dikirin û tê dianîn derê jî. Kubarîya ku wan pê bi şûşeyê şerebê digirt û avayê çavlêgerandina wana ya li nav û nîşanên li ser şûşeyên şerebê çav li meriva bel dikirin. Nazikîya ku wan pê bi kaseye şerebê digirt û şereb di devê xwe werdidan û jê tam dikirin jî şayanî sêyrkirinê bû. Bi van xususîyetên nadir, ew mîna du kesên ku zanîyarîya şerebê û kultura şerebxurîyê xitimkirî xuya dikirin. Me kasêyên şerebê berve jor helnan, li hev xistin û noş û xoşî can kir.

Şofêr û parastin

Li gorê malumatên şofêrên teksîyan, li parêzgeha Hewlerê nêzikî 20 hezar teksî hene. Tê gotin ku nîvê şoferên wan merivê teşkîlata parastinê (istixbaret) ye. Bi rastî jî ji bo bidestxistina malumetan şoferên teksîyan çavkaniyeke pir bi kêr e. Çiqas rast e nizanim, digotin ji şofêrên teksîyan hen bi qestî li hukumetê didin, gilî û şikayetan dikin ku mişterîyan bi dengkirin bidin û bi vê rê malumatan ji wan werbigrin. Li ser hev, bi tehmîn em li bîst teksîyan nîştin. Bi şofêran gîştkan ra me li ser kêşeyên (problem, tahlî, girek) cihê cihê deng dikir. Di nav da yên ji halê xwe û ji îş û karê hukumet û serdariya parêzgehan razî, kêm razî û qet ne razî jî hebûn. Lê mîna xelkê din piranîya wan ji bertîlî (gendelî) û feqîrtiyê bi şikayet bû. Li tevayî Kurdistanê çûyin û hatin tenê bi teksîyan dibe, gîhandina bi otobus, tremway û tren qet tune.

Piraniya teksî û arebeyan nû ye. Hewler tijî arebe ye û meriv nikane rehet bigere û ji aliyekî rê derbase alîyê din bibe. Bi ser da, ew pir bi lez tên ajotin. Pir û hendik, li Duhok û Silêmanîyê jî rewş eynî ye. Li gorê ku qal tê kirin, gîhandina bi otobus û tremwayê tê plankirin. Şofêrên teksîyan gîştik mêr bûn û xwedîyê teksîyên xwe bûn. Em qet raste jineke ku teksîyê diajo nehatin.

www.arsivakurdi.org



Dr. Faik Savaş û Mehmet Ozkan li ser rêya Amedîyê.

Jin û yarenîyek

Li bazarên kevn, li cade, otel, xwaringeh û çayxaneyan jin pir kêm bi ber çavan diketin. Tenê li xanên modern yên mîna Family Mall, Majîdî Mall û dukanên di hundurên wan da meriv raste jinan dihat. Kismek ji jinên ku me didîtin kincên reş li xwe kiribûn. Kismek jî, xasme yên telebe bi kincên modern digerîyan. Ji wan jî henê serpêçayî hen jî servekirî bûn. Tê gotin ku di parlemanê da koteya jina heye û li gorê vê, gerek e ku hêjmara wekîlan ji sedî 30 jin bin. Şevekê em li restoranta Çarçire bûn. Nasên Şefîk û Yakup, Soran û Sîrwan jî teve me bûn. Gava ku qal hate ser jinan, van gotinên han ji devê min derketin: "çar û pênc roj in ku em li vira ne, qet bi jineke kurd va rû bi rû nebûn, me rûyê jinekê ji nêzikî da nedît û dengê jineke ku bi kurdîya soranî deng dike nebihîst. Ma Kurdistana azad welatekî bê jin e çi?" Xwazika min ne gotiba, yên li dor masê vîq û vîq kenîyan. Sîrwan got, aniha ez ê ji jinekê ra telefon kim da ku ew bi te ra deng bike. Min got qey ew î yarenîyê xwe dikê. Lê na, wî li telefonê jineke ku ew nas dike xist û pê ra tozikê deng kir û paşê cîlê telefon da dest min. Ez şaş bûm ku çir bikim û mecbur mam ku bi jinê ra deng kim. Min bi kurmanciyeke ku bi zaravayê soranî xemilandî pêçekê bi ra deng kir. Niha, naye bîra min ku min jê ra çi gotibû jî. Herhal min wer gotibû yan jî ku careke din derfet hebe min ê wer bigota: „Ezîzekem çunî baş î? To nenasim, balam zor xoşhal im. Êsta bextiyar im ke lêre me, welat xoş e, zor cuwan e… Ême li gel hevalekan le çwarçira bo xwardin danîşîne.

www.arsivakurd.org

Min hez dekeym ke li gel we qise dekeym … ! Zor supasî to dekeym, … !“ Yên li ba min dîsa vîq û vîq kenîyan. Mehmê Hemê xenê bû ku Sîrwan telefon nedaye dest wî.

Bertîl (Gendelî)

Bertîlî, bi gotina soranî, gendelî bûye gotineke rojane û di devê herkesî da ye. Bertilî û adîlanê parvakirina heyî û dewlemendiyan wekî girek û kêşeyeke giran dertêne pêş. Ew ê ji bo berjewendîyên sîyasî û destdirêjîyên dervayî têne bikaranîn. Çi sîyasetmedar û çi hemwelatiyên sade gîştik di derheqa hebûna bertîliyê da hemfikir in. Mişkule li ser rê û rêbazên berterfkirina wê da derdikeve meydanê û va jî dibê sebeba serêşî û lihevnekiriyan. Çarelêkirina van kêşeyan di çarçiweke dîyalogî û aştîyane da ji bo pêşvabirina demokrasî, dadmendî, aştîya civakî û parastina ewlekarîya Kurdistana azad îmtihaneke pir giran û pêwîst e.

Duhok, Amedîya û Zaxo

Ji sê parêzgehên Herêma Kurdistana Otonom yek jî Duhok e. Em ji Hewlerê bi teksîyê çûn Duhokê û du rojan li wir man. Me dixwast Duhokê nas bikin û nas û hevalan zîyaret bikin. Bêtalebûne me bû, roja ku me berê xwe da Duhokê, tozeke sor dibarî. Toza sor carcaran ji welatên ereban radibe û bi ser Kurdistanê da jî tê xwarê. Her ku em nêzikî Duhokê dibûn, bilindahî û hêşinahî û hukmê zaravayê kurmancî zêde û toza sor jî kêm dibû. Em danê êvarê gihêştin Duhokê



Mehmet Ozkan li ber Parlamentoya herêma Kurdistanê.

www.wakurdi.org



Li qonaxa valîyê Duhokê: Behzad Ali Adam, Nuh Ateş, Hesen Silêvanî, Mehmet Ozkan.

û li ber otela bi navê Dilşad peya bûn. Li wir hewalê me, kek Dr. Faîk savaş berve me hat. Dora dine rojê, kek Faik em daweta mala xwe kirin. Xanima wî ya ezîz em bi dilgermî û mîvanperverîyeke bê qusur qebul kirin. Kek Faik û kurê wî Lawîn em bi arebeya xwe gerandin. Em çûn cîhên wekî Sersing, Sulavê û qezaya Amedîyê ya ku li navê çavên çîyayekî hatiye avakirin û wekî warê alimdaran tê nasîn. Êvarê em vegerîyan Duhokê. Me li ser mijarên curbicur sohbet kir. Kek Faik ji me ra qala kar û xebatên xwe yên sîyasî yên zêdeyî çel salî ber vê û wekî şahîdê wê bûyerê, qala trajedîya Dr. Şivan û Seid Elçî kir. Kek Faik bi me ra rind eleqedar bû, qedra me zanî û em bi tenê nehîştin. Me bi hev ra wexteke pir rind derbas kir. Li wir dixwazim spasî wî û Xanima wî ya ezîz û kurê wî Lawîn bikim. Duhok bi xwe bajarekî pir şîrîn û bi şuhret e. Di navbera çîyan da li ser gelîyekî pan û fereh hatiye avakirin. Ji ser çîyayê Zawa da meriv hez dike ku li Duhokê sêyr bike. Li Duhokê, nasê Mehmê Hemê, cigirê valîyê Duhokê, berêz Behzad Alî Adam jî bi dilgermî berve me hat. Wî teve biraye xwe, Cotyar û kurê xwe Hevind em li Zaxo û Duhokê gerandin û bi mîvanperwerîyeke bilind em birin û anîn. Wî cihên pir bi şuhret, Pira Delal (Zaxo), Gelîyê Zaxo, Çîyayê Zawa (Duhok) bi me dan nasandin. Berêz Behzad Alî êvarekê em dawete mala xwe kirin û hengivê wê derê îkrame me kir. Hengivekî pir tamxwaş bû. Roja ku em vegerin, Berêz Behzad Alî di avahîya parêzgeha Duhokê da, li dîwana xwe em pêşwazî kirin. Wî em bi serokê Yekîtiya Nivîserên Kurd li Duhokê, berêz Hesen Silêvanî va dan nasandin. Berêz Hesen xwedanê îmtiyaza kovara

www.arsivakurd.org




Mehmet Ozkan û Nuh Ateş li ber derîyê Dergeha Şêx Adî.

Peyv e û endamê Civata Parêzgeha Duhokê ye. Berêz Hesen bi dil û can bervêhatiya me kir. Wî pirtûka xwe ya bi navê, "Ew Xanima Henê" ya helbestan dîyarî me kir. Me jî, xwe pê da nasandin û tozikê qala kurdên Anatolîyê û kovara Bîrnebûnê kir. Di sohbetê da, me xwasteka dilê xwe ya li ser lidarxistina kombûneke sewa nasandina kurdên Anatoliyê û kovara Bîrnebûn li Duhokê anî ziman. Xwasteka me bi dilê berêz Hesen bû û wî anî ziman ku ew ji bo alîkariya kombûneke han amade ye. Me xatirê xwe ji berêz Behzad Alî û berêz Hesen xwast û bo mîvanperwerî û qedirzanîyê spasî wan kir. Em li teksîyekê nîştin û berve Lalişa pîroz bi rê ketin.

Zewaca Arif û tama zarokan

Xwedî û şoferê teksîyê, Arif nasê kek Faîk bû. Şoferî û rêberiya wî baş bû. Merivekî sohbetxwaş bû. Me bi rê da sohbet tîr kir. Me jê zewac û zar û zêç pirs kirin. Bi heldana Arif, wî di ber zewacê jina xwe qet nedîtiye. Digot, "ez î bibext bûm, yeke baş raste min hat!" Dûv ra, wî resmê jina xwe bi me nimand. Mehmê Hemê, resmnimandina wî wekî nîşane dunyadîtiyê mitala kir. Arif bi sala di ser çelî ra bû, lê ew bavê 8 zarokan bû. Wexta ku me jê ra got, "Arif, malneketo ma 8 zarok ne pir in?" wî li me vegerand û got, "bi xwedê, her zarokekî tameke xwe cûda heye!" Bi ser da, ku bi yarênî gotibe jî, wî hîn dile zewacek din jî hebû.

www.arsiv.dicle.org



Geliyê Elîbegê.

Merkeza dînê êzdîyan

Wext bi sohbeta bi Arîf ra xwaş û zû derbas bû. Me nizanî ku em çing gihêştin Lalişê. Laliş merkeza dînê êzdî û cihê hecê ye. Warê dînê ku qibleyê xwe roj e. Dînekî ku zimanê ayîniya wî kurdî ye. Êzdîtî dînekî meleyka yên ku Xwedê ji nûrê çêkirî ye. Dibe ku sewa parastina ji ber hêriş û qirên neyaran be, xan û xanîyên dînî di navbera çîyan da hatine avakirin. Gava em nêzikî wira bûn, nivîsên arkelogê îngliz, Layard û pirtuka nivîskarê elman, Karl May ya bi navê „Durch Wilde Kurdistan“ yên li ser kurdên êzdî hatin bîrîya min. Rojnedîtî û êşkêşîya cimata êzdîyan hate ber çavên min. Qir û talanên bê hed û bê hesab yên ku bi destê desthilatdarîyên cîranên musliman, çi kurd çi tirk û ereb hatine serê êzdîyan li pêş çavên min rêz bûn. Ji av û rûyên wan da ye ku civata êzdîyan xizan û dilşikestî maye. Min xwe wekî kurdekî ji malbateke musilman mehçûp û dêyndar hîs kir. Şukir ku huro li Kurdistana azad qedra dînê êzdî tê zanîn û ezdî tên parastin. Xan û xanîyên dînî ji pir alîyan da, bi dîmen û tevgera xwe va di hal û heyamekî nebaş da xuya dikirin. Xebera xêrê ye, me bihîst ku nûvakirin û modernîzekirina wan hatiye plankirin. Bi rêberîya xortekî, me berê xwe da wargeha pîroz ya ku tirba Şêx Adî lê ye. Me solên xwe êxistin û di ser dêrîyê tirba Şêx Adî ra gav kir û em ketin hundir. Di dor tirbê ra em sê caran çerx bûn û me di ber xwe da due xwandin. Me sê gire li paçê mirazan kirin. Em gavekê li mîvanxaneyê rûniştin û li wir ava zemzemê û çay dana ber me. Dûv ra, me xatirê xwe xwast û dev da rêya Hewlerê.

www.arsivakurdi.org

Şaheserekî tebîetê

Em li Hewlerê li teksîyê siyar bûn û me dev da rêya Gelîyê Elî Begê. Şoferê me, vê carê Abdirehmanê Hewlerî ye. Merivekî şên, yarenîhez û dengxwaş bû. Bi rê da geh sêlikên (CD) muzikê lêdixistin geh jî bi xwe distra. Tu kilamên ku wî nedizanî tune bûn. Li Şeqlewayê me navberek da û li çayxaneyekê êwirîn û çay vexwar. Wekî li bajarên din, xelkê vira jî di rabûn û rûniştin û dengkirina me ra dianî derê ku em ê ji derva hatine.

